GORDOGLI: Yek ji wan gundên kurdan ku zêdetir mirov jê hatine Swêdê, gundê Gordoglî ye (Kurdogli, Gundê Omê, Zincirlikuyu). Navê vî gundî ji peyva Kurdoglî tê ku tê maneya "kurê kurd" (kurdson). Di çavkanî û lêkolînên kevn de wek *Kürtoglu* (Wenzel, 1920) û *Kurd Oglu* (Loewes, 1927) hatiye nîşandin. Çawa em dibînin di van salan de navê *Zincirlikuyu* nayê bi kar anin. Di nav gel de ev gunda zêdetir bi navê *Gundê Omê* hatiye zanîn.

Îro nêzîkî 600 kesî li Swêdê dijîn. Gundê sêwemîn e ku zêde jê kurd hatine Swêdê. Ev cara pêşîn ku gundekî Kurdên Anatoliya Navîn komeleke xwe li Swêdê saz kiriye: *Komela Çanda Kurd ya Gordoglî li Swêdê* (Gordoglu Kurdisk Kultur Föreningen). Qasî 200 endamên komelê hene. Yeki danerên vê komelê, Yusuf Güler derbarê komelê û jîyana Swêdê de waha dipeyîve:

"... Armanca me tenê ne hînkirina zimanê kurdî ye, qasî ziman, şaxsiyet jî muhim e. Em dixwazin pêşerojê de hin tiştan bikin. Em naxwazin Gordoglî li vir bibe cimaeteke girtî û bibe weke kolonîkê. Em dixwazin mirovên Gordogliyê û mirovên Anatoliya Navîn yên mayîn hev nas bikin û bibin yek. Xelqê ji Anatoliyê hatine bi hevre bin. Me gavek avêt, paşê belkî Omera, dusibe Celeb jî komelên xwe saz bikin û paşê

www.arsivakurdi.org



Fîkret Guler bi xelatên ve tê xuyan (Ji arşîva nivîskar).

hêdî hedî ev hemû komelan dikarin bibin yek"[25]

Yek ji wan kurdên ku li Swêdê navdar bûye Fîkret Güler e. Ev kurdê ku ji Anatoliya Navîn hatiye gelek caran bûye şampîyonê spora tekvandoyê (Tae Kwon Do). Fîkret Güler ji gundê Gordogliyê ye. Di sala 1976'an de hatiye Swêdê û niha li Stockholên dijî. Di warê tekvandoyê de heta niha gelek xelatên Dinyayê, Ewrûpî, Skandînavî û Swêdê wergirtine. Di sala 1972'an de bûye şampîyonê Tirkiyê, di sala 1978'an de li Amerîkayê, li Oklohoma xelata duwemîn ya dinyayê, di sala 1982'an de li Macarîstanê bûye şampîyonê Ewrûpayê û gelek caran jî bûye şampîyonê Swêdê û Îskandinavyê. Fîkret Güler yek ji danerên Komela Karkerên Kurd li Swêdê ye ku di sala 1976'an de saz bûye.

HATINA JINAN

Karkerên ku di van salan de hatine Swêdê, jinên xwe bi xwe re neanîne. Di van salan de anîna jinan wek şermekê hatiye dîtin û tu kesî cesaret nekiriye ku zarokên xwe bibine *"welatê gawiran"*. Derbarê vê yekê de gelek serpêhatî tên gotin. Carekê dema kurdek diçe welêt, bi dizîka ji jina xwe re dibêje ku: *"Keçê*



Jineke kurd, Esma Taşbaş ku cara pêşîn di salên 1970'yî de di febrîqeya Volvoyê de kar kiriye (Ji arşîva nivîskar).

www.arsivakurdi.org

tivdarekê xwe bike, ezê vê carê te jî bibime Swêdê. Vê yekê ji tu kesî re nebêje!".[26] Lê belê jina wî vê yekê rojtira din ji bavê xwe re dibêje. Bavê wê dema van gotinan dibihîse gelek hêrsa wî tê û dijî wê yekê derdikeve. Bi kurtî sefera vê malbatê ya berbi Swêdê vê carê bi sernakeve. Vî karkerê kurd piştî deh salan ancax karibûye jin û zarokên xwe bîne Swêdê. Carekê jî malbatek diçe bal melakî (îmam) derbarê çûyîna dervayî welat de ji wî pirsiyaran dike. Piştî ku mela dibêje: " Hûn bi jin û zarên xwe ve tevayî dikarin herine welatekî Ewrûpayê, ev yek normal e", problema jinbirinê çareser dibe.[27] Jinên vî gundî bala biyaniyan jî kişandiye.[28]

Yek ji wan jinên ku cara pêşîn hatiye Swêdê û dest bi kar kiriye Esma Xanim e. Jina Îsa Taşbaş e ku di sala 1966'an de bi serê xwe hatiye. Di sala 1970'yî de zarokên xwe jî anîne. Îsa Taşbaş û jina wî Esma Xanim bi salan di fabrîqeya Volvoyê de kar kirine. Îsa Taşbaş di sala 1993'an de dimre, jina wî Esma Xanim bi zarokên xwe ve niha li bajarê Göteborgê dimîne.



Henifî Celeplî dema li Swêdê mamostetiya zimanê kurdî dike.

Esma Xanim di navbera salên 1970-1980'yî de wek karker di fabrîqeya Volvoyê de kar kiriye. Zarokên wê, sê keçik û du kur li Swêdê mezin bûne û kar dikin. Nîyeta wan ya vegerê vê gavê tune ye. Mirov dikare bêje ku Esma Taşbaş yek ji wan jinên kurd e ku cara pêşîn hatiye Swêdê û di fabrîqeyê de dest bi kar kiriye. Malbateke din ku cara pêşîn ji Cîhanbeyliyê, ji gundê Qirqişlayê hatiye Göteborgê malbata Necatî Ülker bûye. Necatî Ülker di sala 1965'an de bi serê xwe hatiye.[29]

Hin jinên kurd di cîhên din de kar dikin, wek mamoste[30], terciman[31], politikvan[32], memur[33], sekreter[34] ekonomîst[35] û cîhên cuda dixebitin. Yek ji wan Hediye Güzel e ku ji gundê Omera ye. Keça Huseyin Güzel e. Hin caran de di rojnameyan de nivîsên Hediye Güzelê derdikevin.[36] Li Swêdê ulmê polîtîkayê di universîtê de xwendiye. Di nav Partiya Çep de wek berpirsiyara çapemeniyê (pressansvarig) kar dike. Hediye Güzel xûşka Josef Kurdman e. Herdu xûşk û bîra jî bi zimanê swêdî berhemên xwe dinivîsin û diweşînin.[37] Babeta jinên kurd ku ji Anatoliya Navîn tên, bi serê xwe hêjayî lêkolînekê ye. Heta niha di vê babetê de kêm tişt hatine nivîsîn.[38]

KOMELA KARKERÊN KURD YA PÊŞÎN LI SWÊDÊ

Komela kurd ku cara pêşîn li Swêdê ava bûye, *Komela Karkerên Kurdistan li Swêd* e. Ev komele di sala 1976'an de li Stockholmê ji aliyê kurdên Tirkiyê de hatiye saz kirin. Him kurdên ji Kurdistanê û him jî kurdên Anatoliya Navîn cara pêşîn di nav refên vê komelê de hatine bal hev û hev nas kirine.

www.arsivakurdi.org


Sjubarnspappans öde helt i händerna på myndigheterna

Nûçeyek darbarê kurdekî Anatoliya Navîn, Siho Yildirim (20/3. 1976 Aftonbladet).

Kurdên Anatoliya Navîn, bi taybetî jî Kurdên Qonyayê cara pêşîn di nav rêxistineke kurd de cîh digrin. Vê komelê heta niha jî hebûna xwe berdewam kiriye.

Kongra yekemîn ya vê komeleyê di sala 7/11. 1976'an li taxa Tumbayê çêbûye û 120 kes têda beşdar bûne. Serekê komelê yê pêşîn Memo Yetkîn bûye. Paşê heta demeke dirêj Henifî Celeplî serekatiya komelê kiriye. Avakarên vê komelê yên pêşîn ev kes bûne:

Serok: Memo Yetkîn
Cîhgirê serok: Mahmud Baksî
Sekreter: Henifî Celeplî
Cîhgirê sekreter: Ali Gultekîn
Muhasîp: Ferda Turan
Cîhgirê muhasîp: Fikret Güler
Seyfi Dogan
Cevdet Demir
Tevfik Bal

Ji van 5 kes wek Henifî Celeplî, Fikret Güler, Seyfi Dogan, Cevdet Demir û Tevfik Bal ji kurdên Anatoliya Navîn in. Avakirina vê komelê di dîroka kurdên Anatoliya Navîn de xweyê giringîke mezin e. Ev cara pêşîn bû komeleke karkeran ji aliyê kurdan de li Swêdê dihate saz kirin û kurdên Anatoliyê roleke mezin dilîstin. Dema mirov lîsteke fireh ya endamên vê komelê berçav dike, mirov dibîne ku piraniya endamên komelê kurdên Anatoliya Navîn in. Di vê lîstê de navên 343 endaman bi rêza alfabetîk cîh girtiye.[39]

Kurdên ku ji Kurdistanê hatibûn gelek alîkariya kurdên Qonyayê dikirin. Di van salan de çawa em dibînin çend civîn û çalakiyên înformasyonê pêk tên. Yek ji wan li Unîversîta Stockholmê çê dibe, qasî pêncî kesan beşdar dibin.[40] Di roja 19/3 1976'an de 32 kurd pêşiya rojnameya Aftonbladet civîneke protestoyê li dijî biryarên Dezgaha Biyaniyan ya Dewletê (Statens Invandrarverk) çê dikin û dengê xwe didin bîhistin.[41] Di nav van kesan de wek mezinên kurdan Ahmed Ulusoy û jina wî Eyşe Xanim jî hebûye.

www.arsivakurdi.org

Kesên ku tevî protestoyê bibûn daxwaza 100 kurdên ku heta demeke dirêj e mafê rûniştandinê û karkirinê negirtine, anîne zimîn. Kurd bi yekê ve jî nemane, biryar girtine ku di roja 3/12 1976'an ji Stockholmê heta bajarê Norrköpingê bimeşin. Çimkî navenda Dezgaha Biyaniyan ya Dewletê (Statens Invandrarverk) wê demê li vî bajarî bûye. Qasî 35 kes ji bo meşeke 3 rojan li Sergelstorgê berev bûne û di roja 3/12 ketine rê. Di roja 5/12 gihiştine Norrköpingê. Êvaran hin cîhan navbir dane. Ji ber ku zivistan bûye û kurd jî bêtivdarek bûne, hin kes di rê de bêhal dikevin. Bi berpirsiyarê daîra biyaniyan ve gelek pêwendî û têkilî tên dayîn.[42] Di roja 9/11 de kurd piştî ku dighêjin armanca xwe, dev ji greve birçîbûnê berdidin û vedigerin Stockholmê.[43] Rojnameyên swêdî cîhekî fireh dane vê meşa kurdan ya dirêj.[44]

BÛYERA ISMET KESEN - 1979

Di bihara sala 1979'an de bûyera ku li Swêdê zêde deng daye bêguman bûyera Îsmet Kesen e. Ev kurdê 17 salî di sala 1978'an de bi vîzeyê tê Stockholmê û li Swêdê dimîne. Îsmet Kesen ji Anatoliya Navîn, ji gundê Celebê hatiye Swêdê. Paşê dest pê dike li taxa Huddingê diçe dibistanê. Di destpêka sala 1979'an de hikmeta Swêdê biryar digre ku Îsmet Kesen vegere welatê xwe. Lê belê Îsmet Kesen li dijî vê biryarê derdikeve û teslîmî polês nabe. Heval û mamosteyên wî lê xweyî derdikevin, meş, civîn, hevdudîtin û gelek çalakiyên fireh pêk tînin.[45] Îsmet êdî xwe vedişêre. Tenê çend hevalên wî cîhê wî dizanîn. Ev yeka bala medya rojnemeyên Swêdê dikşîne.[46] Yek ji wan nûçeyên ku di sala 1979'an de rojeva Swêdê mijûl dike, bûyera Îsmet Kesen e. Ji bo ku Îsmet Kesen li Swêdê bimîne gelek xebat tên kirin.[47] Jê re avukatekî bi navê Hans Göran Frank tê girtin. Di fondeke bi navê *Ismetfonden* de jê re pere tên berev kirin. Hevalên wî yên dibistanê (Huddingegymnasiet) piştgirtîke mezin ji bo wî nîşan didin, bi meş û civînan ve alîkariya doza Îsmet Kesen dikin. Qasî 40 kes heta meclisa Swêdê diçin.[48] Îsmet ji ber vê alîkarî û piştgirtiya hevalên xwe gelek şa dibe: *"Çi hevalên min yên baş hene. Eger carekê dawiya vî şuxilê bê, ezê şev-roj kar bikim, pera bidim hev ji bo ku hemûyan gazî zîyafetekê bikim"*[49] Hikmeta Swêdê çend caran daxwaza Îsmet Kesen ya li Swêdê mayînê şunda vedigerîne, qebûl nake. Di dawiyê de kesekî sosyal demokrat bi navê Roland Morell dixwaze alîkariya Îsmet Kesen bike û vî xortê kurd ji xwe re wek kur qebûl bike.[50] Vê carê ev yeka bala medya Swêdê dikşîne ser xwe.[51] Piştî tekoşîneke aktîf, Îsmet Kesen di dawiyê de li Swêdê mafê rûniştandinê û karkirinê werdigre.[52] Paşê nav û paşnavê xwe diguhirîne: Cihangir Morell.[53] Bûyera Îsmet wusan jî bala medya cîhanê kişandiye.[54] Yek ji wan kesên ku gelek alîkariya wî kiriye, çawa em ji rojnameyên wan salan fêr dibin, mamosteyê wî Memo Yetkîn bûye.

'PAYTEXTÊ KURDAN' : FITTJA

Kurdên Anatoliya Navîn li Stockholmê zêdetir li belediyên wek Botkyrka, Huddinge û Haninge dimînin. Gelek kurd li taxên wek Fittja, Alby, Halunda, Norsborg, Flemningsbergê, Vårby Gårdê û Handenê dimînin. Hemû ev deran li Stockholma Mezin in (Stor Stockholm). Lî Fittjayê kurdên O-

www.arsivakurd.org

mera, li Flemningsberg û Vårby Gårdê zêdetir kurdên gundê Celebê dijîn. Kurdên ji gundê Gordoglî li her derê Stockholmê belav bûne. Li her bajerekî Swêdê û li her taxeke Stockholmê mirov dikare rastî kurdên Anatoliya Navîn bê.

Lê belê taxa Fittyayê ya bi navê Fittjayê bi hezaran kurdên Anatoliya Navîn dijîn. Piraniya wan ji gundê Omera tên. Fittja wek paytext û navenda kurdên Anatoliya Navîn tê nasîn.[55] Li Fittja çend avahiyên bilind hene ku her avahîkê de qasî 10-15 malbatên kurd dijîn. Wek mîsal ji wan avahiyan, avahîke ku min li wir malbatek zîyaret kiribû, di vê avahiyê de (*Forvägen 39*) qasî 20 malbatên kurd diman. Li Fittjayê kuça *Värdhusvägen* di nav gel de wek kuçeke kurdan tê nasîn.[56] Li taxa Fittjayê wek me li jor jî got çend qahwe û cihê hevdudîtinê yên kurdên Anatoliya Navîn hene. Bi taybetî kurdên salbihurî û teqawit bûne, li wir dicivin, wextê xwe yên vala derbas dikin.



Nûçeyeke nîşan dide ku kurd li Stockholmê zêde li Fittjaayê dijîn (Metro 5/3. 2001).

www.rizgari.org



12 DN SYDVÄST Onsdagen den 17 sept. 1975

Varför får vi inte veta om vi får stanna här?

■ ■ Förstår ni hur det känns att komma som flykting till ett land och gå och vänta på besked om man får stanna? undrar en grupp kurder i Fittja.

■ ■ Många har väntat över ett år på sitt uppehållstillstånd. Under tiden tvingas de leva på socialbidrag eller arbeta svart. De flesta har sina familjer kvar i Turkiet.

■ ■ Huddingepolisens och invandrarverkets orimliga arbetsbörda samt statens rädsla för att ta emot mer arbetskraft än man har jobb för, är två av skälen till flyktingarnas långa väntan, svarar myndigheterna.

När någon, i likhet med kurderna, kommer hit som politisk flykting ska han anmäla sig på närmaste polisstation. Efter några veckor bör polisen ha kallat honom till förhör. Sedan skickas polisen sin rapport till invandrarverket, som inom några veckor bör ge uppehållstillstånd eller meddela avslag. Har man fått uppehållstillstånd, får man i regel också arbetstillstånd.

— I själva verket måste vi vänta betydligt längre på besked, säger en grupp kurder i Fittja. genomsnitt dröjde det ca fyra månader innan polisen över huvud

om man får stanna!

Så här berättar en i gruppen. Vi kan kalla honom A:

• Fjorton kurder från Fittja, som anser att politiska flyktingar får vänta alldeles Sverige.

Kurdên Fittjayê, bi modeya salên 1970'yî (DN Sydväst 17/9. 1976).

Kurd ji berê de li Fittjayê dimînin û navê xwe zûda dane bîhistin.[57] Li dorberê kuça *Värdhusvägen* sedan kurd dimînin, xwastine nêzîkî hev bijîn. Du komeleyên kurdan ku di Belediya Botkyrka de kar dikin, qasî 436 û 491 endamên wan hene. Di dibistana bi navê *Förskolan Humlen* de ku nêzîkî vê kuçê ye, dibistana zimîn heye û zarokên kurdan yên çar salî li vir komeke zimanê kurdî pêk anîne.[58] Di dibistana bi navê *Fittjaskolan* de hejmara zarokên ku kurdî dipeyîvin ji zarokên tirkan zêdetir bûne. Angorî lêkolîner Ann-Helén Lernebo, grûpa kurdan yek ji wan grupên mezin tê hesibandin.[59] Li dibistana *Tallidsskolan* li Fittja de mamosteyek hatiye tayîn kirin ku ew tenê kurdî fêrî zarokên kurdên Anatoliya Navîn dike. Qasî 62 zarok li vê dibîstanê perwerdegariya zimanê zikmakî dibînin.[60] Ez bawer dikim ku ev mîsalê Fittja ji bo çend taxên Stockholmê yên mayîn jî derbas dibin ku zêde kurd lê hene. Çawa di vê mîsalê de tê xuyan hemû îmkan ji bo kurdan û zarokên wan hatine amade kirin.

Wek me li jor jî got li Belediya Botkyrkayê gelek kurd dimînin bi taybetî kurdên Qonyayê.[61] Ji bo ku zarokên kurdan baş bên perwerde kirin, çend xebat li vê taxê hatine pêk anîn. Li taxa bi navê Fittja, di dibistaneke vekirî bi navê *Myran* de di sala 1982'an beşa resim û di sala 1983'an de beşa marangozîyê vebû. Qasî 20-30 zarok tevî van çalakiyan û xebatan bûn. Yek ji karmendên vê dibistanê Susanne Johansson derbarê van zarokan de lêkolînek amade kiriye.[62]

Lêkolîner Hassan Hosseini-Kaladjahi li vê deverê lêkolîneke fireh pêk


www.ersivakurdi.org

aniye ku gelek tiştên balkêş pêşkêşî me dike. Pênc zimanên mezin ku li vir tên axaftin, ev in: swêdî (15 %), erebî (13 %), kurdî (13 %), tirkî (11 %) û spanî (8 %).[63] Kurdên ku li vir dijîn xwedî gelek pizmam in.[64] Hejmara kurdên ku pizmamên xwe bi kêmanî heftê carekê zîyaret dikin 55 % e. Di nav kurdên Fittjayê de 35 % xwedî şîrketên şexsî ne, esnafiyê dikin.[65] Di nav komên biyanî yên ku di nav wan de bêkarî gelek kêm e, koma kurdan de. Piraniya wan kar dikin. Ji kurdên Fittjayê 70 % gotine ku ew dixwazin bi temamî li Swêdê bimînin. Ji wan 50 % bûne hevwelatiyê Swêdê. Angorî vê lêkolînê hejmara kurdên ku televîzyonên swêdî mêze dikin, ne zêde ne. Ev yeka nezanebûna zimanê swêdî ve girêdayî ye. Wek çend komên mayîn yên biyaniyan kurd jî kêm tevî çalakî û xebatên komeleyên swêdî dibin, wek mîsal tenê 4% kurdên Fittjayê endamên komeleyên swêdî ne.[66] Ev yeka jî nîşan dide ku her çîqas kurd li Swêdê dijîn jî, ew zêdetir di bin bandûra çand û edetên xwe de mane. Derbarê entegrebûnê de carina astengî û dijwarî derdikevin pêşberî kurdên vê deverê.

Kurdên Anatoliya Navîn dema hatine Swêdê rastî gelek dijwarî, astengî û problemenên mayin hatine. Di salên 1980'yî de du pedagogên kurd li vê deverê malbat û zarokên kurdan ve kar kirine.[67]

XEBATHEZIYA KURDÊN ANATOLIYÊ

Bi taybetî bi sedan kurdên Anatoliya Navîn, li Swêdê xweyê cîhên kar in. Berê hejmara van cîhan gelek kêm bûn, tenê li bajarên mezin yên wek



Fexrettîn Topal dema li Stockholm kar dike.

Stockholmê, Uppsalayê û Göteborgê hebûn. Çend lêkolîn nîşan didin ku ev kurdên ku şîrketên xwe saz kirine, ji aliyê dewletê de zêde alikariyê nabînin. Bi îmkanên xwe yên sînorkirî û hundurî ve karên xwe dimeşînin. Bi taybetî ew tora navbera nas, pizmam, heval û dostan de pêk hatiye gelek caran wek bankan roleke mezin dilîzin. Kêmzanîna zimîn û nenasîna mercên Swêdê gelek caran dijwarî û serêşiyan derdixe pêşberî esnafan. Kurd ne tenê li bajarê Stockholmê û Göteborgê berev bûne. Li gelek bajarên mayîn jî dimînin. Wek mîsal qasî 30 malbat ji Anatoliya Navîn, ji devera Yunakê hatine Malmoyê cîwar bûne, hemû bi tîcarê ve mijûl dibin. Cîhê wan yên bi xwe hene, wek cîhên pîzayê, restorang û dikanên ku tiştên xwarin û vexwarinê difroşin. Yek ji wan Cemal Ulusoy e ku cîhekî wî yê bi navê *Ölkafé* heye.[68]

Niha li her derên Swêdê, heta cihên piçûk wek gundan mirov dikare rastî

van cîhên kurdan bên. Hin kurd hene du-sê cîyên wusan vekirine, bi taybetî restorant û dikanên pîzayê ne. Pazara îtalyanan xistine destê xwe. Ji wan gelek şofêrtiya texsiyan dikin.

"HERE! XWE XELAS BIKE!"

Koçberiya kurdên Anatoliya Navîn ber-bi Swêdê hertim ewqas rehet nebûye. Gelek dijwarî, serêşî û problemên cuda derketine pêşberî wan. Hin kes bi rêyên normal hatine û hin kesan rêyên din ceribandine. Piraniya wan ji bo ku aborî û debara xwe bikin, derketine Ewrûpayê. Yek ji van welatan yên herî populer Swêd e. Swêd ji bo wan bûye rêya xelasiyê. Gelek dê-bavan derbarê Swêdê de zarokên xwe bi zanetî şîret kirine û rê dane ber wan: *"Here! xwe xelas bike!"*

Babeta koçberiya Kurdên Anatoliya Navîn paşê bûye babeta pirtûka Margareta Hanson. Pirtûka Margareta Hanson ku di sala 2001'an de bi navê *Rojnotên Remî* (Remis dagbok) derket ji aliyê dostanetiya kurdan-swêdiyan de berhemeke gelek balkêş e. Di vê berhema delal de serpêhatiya xortekî kurd heye ku Anatoliya Navîn tê. Ev xortê 15 salî bi navê Remî dema tê Swêdê di kampeke penaberan de dimîne (Navê wî yê rastîn hatiye guhartinê). Di vê kampê de qasî[71] hevwelatiyên Remî yên kurd jî hene. Yek ji wan nasê Remî derdikeve, navê wî Hesen e. Gelek caran li Remî diparêze û alîkariya wî dike. Çend sal derbas dibin, lê belê destûra li Swêdê mayîn û karkirinê ji Remî û hevalê wî Amîr re dernakeve. Di vê navberê de gelek serêşî, astengî û problem derdikevin pêşberî Ramî û penaberên din. Di dawiyê de xanimeke swêdî bi navê Marianne digihêje hawara Remî. (Belkî jî nivîskar bi xwe ye!). Ev xanima xêrxaz dixwaze Remî bike ewledê xwe. Marianne di maleke mezin de bi serê xwe dimîne. Armanca vê xanimê ew e ku çend zarokên kurd ji xwe re bike ewled. Lê belê dadigehên swêdî dijî vê yekê jî derdikevin. Xortekî mayîn bi navê Amîr jî tîne mala xwe. Bi vî tehrî Remî û Amîr wek du bira di mala vê jina swêdî de dijîn.



Maleke nûçêkirî li gundê Omera (Ji arşîva Josef Kurdman).

www.arsivakurdi.org

Remî êdî vê xanima swêdî wek diya xwe dibîne û jê re dibêje: *dayê!* (mama).

Ev berhema dokumenter mirov dikare bêje ku periyodeke jîyana nivîskar Margareta Hansonê pêk tîne. Berhemeke bîyografîk e. Ew herdu zarokên ku romanê de qala wan tê kirin (Remî û Amîr) kurdên Anatoliya Navîn in. Paşê ev herdu zarok ji Amerîkayê vedigerin, tên Swêdê. Yek ji wan Amîr niha li bajarê Göteborgê dijî. Di pirtûkê de paşnava Remî wek Ararat derbas dibe: *Remi Ararat.* Min carekê ji nivîskar pirsî: "Çima te navê vî mêrxasî daniye Remi Ararat?". Wê got ku: "Angorî îfadeyan van xortan, kal-bavên wan ji devera Agiriyê (Ararat) çûne Qonyayê". Nivîskar Margareta Hanson berî ku vê berheme xwe binivîse, demekê Anatoliya Navîn zîyaret kiriye, li wir çend lêkolîn pêk anîne. Wusan jî dêbavên van xortan dîtiye. Ev berhema derbarê serpêhatiya kurdên Anatoliya Navîn de berhemeke domunter dikare bê hesibîn.

KURDÊN ANATOLIYA NAVÎN KOKA XWE DIGERIN

Piştî ku kurdên Anatoliya Navîn derketin derva, li Ewrûpayê bi kurdên ji Kurdistanê hatî ve nasiya xwe dane hev. Ev kurdan pey koka xwe ketin, pey dîrok, ziman û folklora xwe ketin. Mirov dikare bêje ku Kurdên Anatoliya Navîn cara pêşîn nasîya xwe li Swêdê dane xwe û xwe nas kirin. Ev rabûn û hişyarbûna etnîkî, çandî û dîrokî îro jî berdewam e. Dîroka peydabûna wan ya etnîkî (etnogenesis) ji wan wek babeteke here giring dikare bê hesibîn. Dokument, belge û çavkaniyên dîrokî gelek bala wan dikşînîn. Ew dixwazin fêr bin ku ew ji ku tên û çawa, çi wextî hatine Anatoliya Navîn. Ev macera û serpêhatiya wan babeteke gelek balkêş. Çawa tê zanîn li Tirkiyê li ser kurdan zordestîke etnîkî ya bêhempa heye. Gelek kurd haya xwe ji koka xwe tune bûn. Ev firsend îro ketiye destê wan.

Di vî warî de yek ji wan serfiraziyên kurdên Anatoliya Navîn bêguman derxistina kovara *Bîrnebûn* e. Ev cara pêşîn bû ku kurdên vê deverê bi zimanê kurdî organek û weşanek derdixin. Ev yeka di dîroka wan de tiştekî teze ye. Bîrnebûn li Stockholmê tê weşandin. Di navbera van salan de (1997-2002) qasî 15 hejmar derketine. Heta niha gelek nimûneyên ziman, folklor, edebiyat û dîroka kurdên Anatoliya Navîn di nav rûpelên vê kovarê de weşiyane. Wusan jî nivîsên danasînê û lêkolînên cihêreng têda derketine. Bîrnebûnê di di nav van 5 salan de di warê pêştabirina kurdên Anatoliya Navîn de roleke mezin lîstîye û dilîze.

Di sala 2002'an de li Stockholm gelek kurdên Anatoliya Navîn hatin bal



hev û waqfek saz kirin. Navê wê danîn *Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn* (Stiftelsen av kurder från centrala Anatolien). Çawa em dibînin 36 kesên ji deverên gelek cuda ev waqfa saz kirine.[69] Serokê waqfê Mahmut Baran e ku ji gundê Kuşça hatiye Swêdê. Li Swêdê ekonomi û hukuk xwendiye. Vê waqifê pêştabirina çanda kurdî wek armanceke here mezin daye pêşiya xwe.

Yek ji van pêşketinên çandî sazbûna kurdên Anatoliya Navîn, sazkirina Weşanxana Apecê ye. Ev dezgeha kurd bi navê *Weşanxane û Çapxana Apec* (Apec tryck och förlag) tê bi nav kirin. Li Swêdê û li Ewrûpa di nav weşanxaneyên kurdî de weşanxana ku heta niha zêde pirtûk çap kirine, weşanxana APEC. Xweyê vê weşanxaneyê jî çawa tê zanîn kurdekî Anatoliya Navîn, Elî Çiftçî ye.[70] Ne tenê weşanxane, wusan jî çapxaneke vê weşanxanê heye. Birayê Elî Çiftçî yê mezin Mecît Çiftçî ev 15 sal in tek-tenê di nav kaxiz û dengê maşînên vê çapxanê de de jîyana xwe derbas kiriye. *Weşanxana Apec* di sala 1988'an de saz bûye. Heta niha qasî 200 pirtûk ji aliyê Apecê de hatine weşandin.[71] Di sala 1998'an de vê weşanxaneyê bi şahîke mezin ve dehsaliya xwe pîroz kir. Di sala 1999'an de Apec ji aliyê *Fonda Nivîskarên Swêdî* hate xelat kirin. Ji bo ku Apecê bi rêya wergeran di nav kurdan de alîkariya danasîna edebîyata swêdî kiriye, vê fondê 25 hezar kronên swêdî wek xelat daye xweyê çapxanê Elî Çiftçî. Bi kurtî mirov dikare bêje ku APEC him ji bo kurdên Kurdistanê û him ji bo kurdên Anatoliya Navîn bûye navendeke çandî li Swêdê.

Ji aliyê din ev çend sal in Yusuf Özden bi navê *Weşanxana Medya* weşanxanek saz kiriye. Yusuf Özden ji gundê Kelhesen e û niha li Stockholmê dimîne. Bi navê *Still Offset ab* çapxaneke wî û ni navê *Medya* weşanxaneke wî jî heye.

Çend kesên ku ji Anatoliya Navîn hatine wek Josef Kurdman[72], Ihsan Eken[73], Abdullah Dogan[74], Şoreş Reşi[75], Xizan Şilan[76] û Hesenê Alê[77] îro li Swêdê bi karên nivîskarêyê û lêkolînvaniyê ve mijûl dibin. Ji wan Josef Kurdman ji gundê Omera ye. Heta niha çend berhemên wî çap bûne. Wî navê xwe guhirandiye, kiriye Uso Kurdman û bi vê kirinê xwastiye nasnameya xwe ya kurd derxîne pêş. Di dibistanan de gelek caran alikariya nivîskariyê dide zarokan û wek integrationskonsult kar dike. Di sala 2000'an de Belediya Huddingê ji ber serfiraziyên wî yên nivîskariyê wek xelat, *Bursa Kulturê* (Kulturstipendium) daye Josef Kurdman. Çend nivîsên li di weşanên cûda der çûne.[78] Di romana wî ya piçûk de serpêhatiya yekî tirk heye ku bi otobosê derketiyê gerekê, lê belê gereke bi zef tehlûke! Di vê romana bi navê *Jîyana bi şand* (Leva på tur) behsa kaosa trafîkê li Tirkiyê dike û çend bûyerên mayîn bi zimanekî sade û uslubeke rindik hatine nivîsandin. Bûyer ji devê yekî tirk tên vegotinê û forma "ez" (jag) hatiye bi kar anîn. Kurdekî mayîn ku ji gundê Omera tê jî Ihsan Eken e ku xwandina xwe ya bilind li Swêdê qedandiye. Li ser dîroka biyaniyên li Swêdê xebateke wî heye.[79]

Êdî gelek zarok û xortên Kurdên Anatoliya Navîn diçin dibistanên cihêreng. Beşek ji wan heta unîversitan xwendina xwe berdewam dikin. Hejmara wan wusan zêde bûye ku di dawiyê de komeleke xwe jî saz kirine. Ev komela bi navê *Komela Kurd ya Lîseyê*



16 24. november 1999 WESTegnen

En pige med stor Miss-forståelse

Tilværelsen slog en flikflak, da Zahide Bayram fra Ishøj blev kåret til Miss Danmark - fra et anonymt liv som pædagogmedhjælper er hun nu på forsiden af alle blade - og TV-stor i Tyrkiet

Tekst: Michael Engelbrecht

"Miss Danmark" står der med kæmpebogstaver på tavlen i Al-klubben i Ishøj.

Ungerne i Ishøj er helt vilde. Deres pædagogmedhjælper Zahide Bayram blev kåret til Miss Danmark torsdag - og fredag var institutionen på Kirkebjerg Vænge i Ishøj på den anden ende.

Jeg nåede kun at være på arbejde en time, så måtte jeg gå hjem, fortæller hun. De ville alle sammen sidde hos mig og røre ved mig, så det blev næsten for meget. Det var også alle mulige journalister, der ringede hele tiden, så vi blev enige om, at jeg skulle holde fri resten af dagen.

Titlen som Miss Danmark har i den grad vendt op og ned på Zahides liv.

Fra at være en anonym pædagogmedhjælper og studerende på VUC Vest, så er hun i dag verdensberømt i både Danmark og Tyrkiet, og journalister står næsten i kø for at tale med hende.

-Jeg er lidt træt i dag, siger Zahide, for jeg var tidligt oppe for at være med i Morgen-tv, fortæller hun. Så vi måtte op mandag formiddag i al-klubben, hvor hun bor, og sammen med den [illegible] digvis har hun en forstående chef, for hun bliver ustandselig forstyret af arrangører og pressefolk, der vil tale med hende - altså inklusive VESTegnen - så det er ikke nemt at passe hjem på de betingelser.

-Siden vi snakkede sammen for en time siden, har to tyrkiske tv-stationer ringet og inviteret mig til Istanbul for at være med i talkshows, fortæller hun.

Zahide ved kåringen på Fasrgen Sjælland (Foto: Arrangøren)

Men den 18-årige skønhed fra Ishøj Landsby synes at have begge ben planlet solidt i den [illegible]

flyveren til Tyrkiet allerede i morgen, men det sagde jeg nej til. Det er min fødselsdag, så de tyrkiske tv-stationer må vente til sidst på ugen, siger hun.

Det er noget af en drøm, der er gået i opfyldelse for Zahide. Hun har længe ønsket at blive model, og har bl.a. forsøgt at sende fotos ind til bureauerne.

-Det var bare nogle amatørbilleder, for jeg havde jo ikke råd til en professionel fotograf. Jeg fik da heller ikke nogen positive svar. Men nu kan det være, at nogen får øje på mig, siger hun.

-Det var nærmest for sjov, at jeg meldte mig til den første Miss-konkurrence. Der var ingen, der vidste noget om det, men da jeg gik videre, var jeg nødt til at fortælle det til familien. Efter den første overraskelse har de bakket mig op hele vejen igennem, og min far er meget stolt af mig, fortæller hun.

Zahide er dansk statsborger, og føler sig som dansker.

-Jeg har jo boet her hele mit liv, som hun udtrykker det.

Men hun er da helt klar over, at det kunne give problemer, at hun blev Miss Danmark i forhold til den tyrkiske befolkning i [illegible]

Trods titel og bekrømmelse var Zahide tilbage på jobbet næste dag - og ungerne var helt vilde over at have en Miss Danmark som pædagogmedhjælper.

Faderen er kørelærer, og driver sideløbende en mindre restaurant, hvor moderen også hjælper til.

-Men selv om vi på mange måder er blevet helt danske, så betyder det ikke, at vi har opgivet vores egen kultur, pointerer hun. Men erkender dog, at det kniber lidt med det tyrkiske sprog, da hun jo kun har boet i Tyrkiet nogle få måneder som spæd.

-Jeg sagde da også til tyrkisk tv, at jeg ikke kunne sproget som en indfødt. Men de mente, at når vi uden problemer kunne snakke i telefonen

-Jeg er kurdisk og kommer fra Konya. Men det meste af familien bor i dag i Danmark og Norge. Så hjemme taler vi både dansk, kurdisk og tyrkisk. Vi tager stadig på sommerferie til Tyrkiet, selv om det kun er min tante og nogle fjerne slægtninge, der i dag er tilbage i Konya, fortæller hun.

[illegible] jeg vil være. Men det skal v[illegible] er humanistisk fag. Efter [illegible] evt. modelkarriere er det [illegible] at have en uddannelse at fa[illegible] tilbage på.

Her må vi sige farvel [illegible] kun få minutter [illegible] gerne få fri [illegible] de skal [illegible]

der ville komme noget kritik, da det jo ikke er alle, der er lige så moderne indstillet som min familie, siger hun.

Men selv om der nærmest har været telefonstorm i [illegible] enden, så er der [illegible] positive [illegible]

stående.

At familien i sjælden grad er glædet ind i den danske samfund fremgår af det faktum [illegible]

Zahide Bayram ji gundê Omera di sala 1999'an de bûye Bedewa Danîmarkayê. 24/11 1999 WESTegnen. (Ji arşîva Rojen Hazim).

li Botkyrka (Kurdiska Gymnasieföreningen i Botkyrka) di 8 Adarê sala 2002 saz bûye.

Wusan tê xuyan ku kurdên Anatoliya Navîn dixwazin di warê gulvedana çandî û dîrokî de "bahar" a xwe ya teze li Swêdê bijîn. Ne tenê hatina Ewrûpê û Swêdê, ew wusan jî derketine seyraneke dîrokî, pey koka xwe ketine û koka xwe digerin. Ew pey dokument û belga, nimuneyên folklora xwe, hebûnên etnografîk û berî her tiştî pey bersîva vê pirsê ketine: *Em ji ku hatine Anatoliya Navîn û çi hatiye serê me?* Ev gav û hewldayîna giring ji bo kurdên Anatoliya Navîn proseseke nû ye. Ev cara pêşîn e ku ew nasiya xwe didin xwe. Bi kurtî mirov dikare bêje ku kurdên Anatoliya Navîn dixwazin dîroka xwe ji nû ve binivîsin û neyên ji bîr kirin. Ji bo van armancan belkî navên weşanên xwe bi zanetî danîne *Bîrnebûn* û *Veger.*


DAWÎ

Ji aliyê din çend gund û qezayên kurdên Anatoliya Navîn ji ber pêwendiyên bi dorber re hêdî hêdî diguhirin, ji qalib û strukturên xwe yên kevn derdikevin. Ew navlêkirinên wek *"Moskovaya piçûk"* (ji bo Karacadagê)[80] û *"Moskovaya mezin"* (ji bo Gordoglîyê)[81] nîşanên van guhartinên sosyolojîk in. Ev "navlêkirinên teze" ji alîkî de bi zêdebûna hejmara kesên xwendekar ve, bi pêştaçûyîna aborî û bi pêwendiyên welatên ewrûpayê, yên wek Swêdê ve girêdayîye. Belê kurd û gundên Anatoliya Navîn diguhirin. Çawa tê zanîn berê Anatolî bi navê *Asya Piçûk* (Asia Minor) dihate bi nv kirin. Lê belê îro êdî ev gundên kurdan

www.arsivakurdi.org

bûne: *Avrûpaya Piçûk* (Europa Minor)! Bi kêmanî xerîbên ku tên van gundan, wusan difikirin. Rast e jî. Çawa îro em dibînin îro nigekî van li li Asyayê, nigekî wan li Ewrûpeyê ye.

Bi taybetî kurdên Anatoliya Navîn piraniya sermaya xwe li welêt radizînin. Li gelek deverên Anatoliya Navîn xaniyên modern wek vîla ava dikin. Havînan diçin welêt, tetîlên xwe li çolên Anatoliya Navîn yên zerîn derbas dikin. Jîyana axa xwe ji zeryayê (behr) tercîh dikin. Gelek kes van xaniyên tezeçikirî û nûjen wek "havîngeh" bi kar tînin. Zivistanan kes li van xaniyan de namîne, deriyên wan kilît dikin, careke din vedigerin Swêdê. Ew bûne xweyê du welatan. Kurdên Anatoliya Navîn ji bo rojên pêş wek "temînateke manevî " li van avahiyan mêze dikin. Bûyîna ewrûpayî ewqas rehet nîne. Bi taybetî nifşa salbihurî, kal-pîr bi hiş û tevger zêde nêzîkî "ewrûpabûyînê" nabin. Beşeke kurdan heye ku bi çêkirina xaniyên super-modern ve mirov dikare bêje ku tenê maddiyatê nafikirin, ew wusan jî pey hizûreke hundirîn ketine an jî ji bo paşerojê (istikbal) bi zanetî tivdarekê hizûreke bêdawî (ebedî) dikin: "*Qet nebe dema em dimrin, bila cîhekî me yê fireh û rind hebe, cenazê me li ortê nemîne!*"[82]



Hermann Wenzels karta. Kulubygden i slutet av 1920.

JÊRNOT:

1 Rohat Alakom, *Orta Anadolu Kürt Literatürüne Bir Katkı,* Bîrnebûn, hejmar: 8, 1999.

2 Georges Perrot, *Kurdên Haymanayê,* Apec, 2000, rûp.30.

3 Jan Hjarnø, *Indvndrere fra Tyrkiet i Stockholm og København*, Sydjysk Universitetsforlag, Esbjerg, 1988.

4 Ingrid Lundberg, *Kulubor i Stockholm*, Stifselsen Sveriges Invandrarinstitut och Museum i Botkyrka, Stockholm, 1991.

5 Ingrid Lundberg & Ingvar Svanberg, *Kulu-Utvandrarbygd i Turkiet*, Uppsala, 1992.

6 Wek mîsal di sala 1980'yî de li Etnografiska Musset de pêşangehek derbarê xalîçêkirinê de hatiye amade kirin. Çend jinên kurd tevî vê peşangehê bûne û di pêşangehê de wek nimûne xalî çêkirine. Di organeke tirkî de ev jina, hemû wek tirk hatine nasandin (Binêre: *Yeni Birlik* 22/198). Lê belê çavkanîke swêdî dide dîyar kirin ku jinên kurd jî tevî vê peşangehê bûne (Binêre: Ingrid Lundberg, *Kulubor i Stockholm*, rûp.155). Qiralîça Swêdê, Sîlvia jî di vekirina vê pêşangehê de beşdar bûye û bi van jinan ve sûret jî kişandine. (Dîsa binêre: Ingrid Lundberg, *Kulubor i Stockholm*, rûp.155).

7 Rohat Alakom, *Orta Anadolu Kürt Literatürüne Bir Katkı,* Bîrnebûn, hejmar: 8, 1999.

8 Rapora Xebatê ya Komela Karkerên Kurdistanê (Di arşîva Henifî Celeplî ye).

9 Dara Şîran, *Kurder i Centrala Anatolien,* Maj 1981, Tvåbetygsuppsats.

10 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn, 14/1. 2001. Stockholm.

11 *Şeveke Bîrnebûnê li bajarê Goteborgê,* Bîrnebûn, hejmar: 13/2001.

12 Bi Josef Kurdman re hevpeyvin, 2/4. 2002 Vårby Gård.

13 Altun Başaran, *Bi Bilal Harman re hevpeyvîn.* Bîrnebûn, nr. 16/2002.

14 Altun Başaran, *Bi Kadir Çelik re hevpeyvîn.* Bîrnebûn, nr. 16/2002.

15 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn 14/1. 2001.

16 *"De första åren i Sverige var kämpiga"*, Avisen 26/4. 1999.

17 Bi Fexrettin Topal re hevpeyvîn 9/4. 2002 Stockholm.

18 Ev reqemên gulover bi saya agahdariyên Omer Sarıhan, Mustafa Sarıhan û Bekir Uzunel hatine tespit kirin ku hersê jî ji gundê Omera ne û bi salan in li Swêdê dijîn.

19 Jan Hjarnø, *Indvndrere fra Tyrkiet i Stockholm og København*, Sydjysk Universitetsforlag, Esbjerg, 1988.

20 *Danmarks smukkeste!* Zapp-Jorden Rundt. Nr. 2/200.

21 Bi Fexrî Ulusoy re hevpeyvîn 17/1. 2001. Uppsala.

22 *"Hjälp oss - Vi lever i skräck"*, Aftonbladet 20/3 1976.

23 Bi Ahmed Ulusoy re hevpeyvîn, 24/11. 2000. Stockholm.

24 Bi Henifî Celeplî re hevpeyvîn, 6/11.2000. Stockholm.

25 Bîrnebûn, hejmar: 15/2002.

26 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn, 14/1. 2001.

27 Bi Abdullah Uzunel re hevpeyvîn 14/1. 2001.

28 Margareta Brinde / Inger Morris, *Bland kvinnor i Turkiet.* SIL. 1993.

29 Bi Esma Taşbaş re hevpeyvîn 1/11. 2000. Stockholm.

30 Nimet Sütçü, li Göteborgê beşa mamostetiyê qedandiye. Niha li Stockholmê dimîne û wir kar dike.

31 Altun Başaran wek tercimanê kurdi, swêdî û tirkî kar dike.

32 Aynur Beydogan li Uppsalayê di nav Partiya Çep de kar dike.

33 Şîlan û Mînge ji devere Haymanayê li Uppsalayê dimînin û li wir kar dikin. Binêre: *Kurd-protest i Uppsala,* UNT 6/4. 19991. Ev herdu jî xûşkên Hatîce Yaşar in. Wek tê zanîn Hatîce Yaşar bi salan bi polîtîkayê va mijûl bûye.

34 Demet Etî li taxa Tenstayê di Îdara Sosyalê de wek sekreter kar dike.

35 Sıdıka Celepli ji gundê Celep e, li Îngilterê xwandiye û niha li Hongkongê kar dike.

36 Hediye Guzel,*Invandrare med examen ej önskvärda,* Metro 3/2. 2000. Hediye Guzel, *Fadimes kamp för kvinnors rätt,* Metro, 26/1. 2002.

37Bi Josef Kurdman re hevpeyvin, 2/4. 2002 Vårby Gård.

38 B. Uzunel / M. Sarıhan, *Utbildningsbehovet hos kurdiska kvinnor och ungdomar i Botkyrka,* Botkyrka Kommun, 1987. Oscar Pripp, *Kulturbundna attityder och anpassningar till bostadsmiljön - En boendeundersökning bland turkar och kurder i Fittja,* Byggforskningsrådet R5.1990. Abdullah Dogan, *Massmedia och invandrare,* APEC, 1997.

39 Kopiyake vê lîsteyê di arşîva Memo Yetkîn de ye.

40 Memo Yetkin, *Kurderna och Kurdistan,* Socialstyrelsen, 1984, rûp.152.

41 *"Hjälp oss - Vi lever i skräck"*, Aftonbladet 20/3 1976.

42 *Människors vänlighet bästa värmen för kurderna,* Norrköpins Tidningar - Östergötlands Dagblad 8/12. 1976.

www.ekurdi.org

43 *Kurderna får besked,* Norrköpins Tidningar - Östergötlands Dagblad 10/12. 1976.

44 *Kurder går 17 mil i protest,* Dagens Nyheter 4/12. 1976. *Kall marsch för kurderna,* Dagens Nyheter 6/12. 1976.

45 *Kamraterna gömmer Ismet undan polisen,* Aftonbladet 23/2. 1979.

46 *Ismet 17, skyddad av sina maskerade kamrater: "Jag ska bjuda alla på en stor fest",* Aftonbladet 3/3. 1979.

47 *Huddingeeleverna vädjar till polisen: Stoppa jakten på Ismet,* Aftonbladet 5/3. 1979.

48 *Ismet fick nej igen,* Aftonbladet 15/3. 1979.

49 *Ismet 17, skyddad av sina maskerade kamrater: "Jag ska bjuda alla på en stor fest",* Aftonbladet 3/3. 1979.

50 *Politiker vill adoptera Ismet,* Aftonbladet 2/3. 1979.

51 *Första mötet: Ismet och hans nya pappa,* Aftonbladet 8/3.

52 *Ismet leder anti-rasistisk rörelse,* Aftonbladet 3/5. 1979

53 *Ismets första sommarlov,* Vecko Revyn, nr 29/1979.

54 *"Wiking" groups breed racism in Sweden.* The Guardian 21/3 1979.

55 *Många kurder i Fittja,* Metro 5/3. 2001.

56 Bi Ali Koç re hevpeyvin, 22/12. 2000. Stockholm.

57 *Varför får vi inte veta om vi får stanna här?* DN-Sydväst 17/9. 1975.

58 Ann-Helén Lernebo, *Kartläggning av Fittja - Material insamlat under januari och februari 1999,* Mångkulturellt Centrum, 1999, rûp.20.

59 Ann-Helén Lernebo, rûp.23.

60 Bi mamoste Mehmet Balta re hevpeyvîn 16/4.2002.

61 *Barngång skapar en tuff värld,* Svenska Dagbladet 29/6. 1983.

62 Susanne Johansson, *Barn utan tillsyn,* Påbyggnadskurs i pedagogik. Pedagogiska ins., Stockholms Universitet. 1983, 81 sid.

63 Hassan Hosseini-Kaladjahi, *Tusen röster om Fittja,* Mångkullturellt Centrum, 2001, rûp.7.

64 Eynî çavkanî, rûp.13.

65 Eynî şavkanî, rûp. 47.

66 Eynî çavkanî, rûp. 88.

67 Serefxan Ciziri & Mehmed Uzun, *Verksamhetberättelse för verksamhetsår 1982-1983. Familjepedagogiska verksamheten i Botkyrka Kommun.*

68 Bi Cemal Ulusoy re hevpeyvîn, Malmö, 17/11. 2001.

69 Harun Coşar, Ali Çiftçi, Akif Özdemir, Ahmet Tarhan, Mustafa Kara, Nuri Kara, Ziya Güler, Zafer Güler, Kaplan Keskin, İhsan Eken, İsmet Aktaş, Mecit Çifci. Yusuf Özden, Ali Yagci, Haci Mustafa Çelik, M. Yusuf Güler, Raşit Karakuyu, Metin Güler, Hamit Atmaca, Mahmut Arıkan, İbrahim Yıldırım, Ömer Sarıhan, Mahmut Baran, Kerim Yıldırım, Engin Yıldırım, Yusuf Yıldız, Hayrettin Tümtürk, Mehmet Kesmez, Süleyman Köksal, Ali Çoşar, Haci Baysal, Mehmet Bal, Hikmet Altas, Kemal Yıldırım, Seyfi Dogan, Şükrü Cilek.

70 Karin Levander, *Ali sprider kurdiska böcker i Sverige och svenska böcker i Kurdistan,* Sesam nr 46/2000.

71 Jean-Cladue Hussais, *Europas största kurdiska förlag ligger på Spångavägen,* Karavan nr 1/2000.

72 Josef Kurdman, *Leva på tur,* Visby, Veckans Bok, 2000.

73 Ihsan Eken, *Sveriges flyktingpolitik 1900-1984.* Uppsats för proseminariet i statskunskap och sociologi vid högskolan i Karlstad, hösten 1993.

74 Abdullah Dogan, *Familjen Kevo,* AB-Uppsats i psyko-socialt beteende, Umeå Universitet, 1990. *Kurder och TV-Nyheter,* B-Uppsats, JMK Stockholms Universitet, 1997. *Massmedia och invandrare,* APEC, 1997. *Kurdiska tonårsflickor,* Edsburk, 1998.

75 Şoreş Reşî, *Palme, PKK ve Gladio.*

76 Xizan Şilan, *Acılar Sokağı,* Medya, 2000.

77 Hesene Alê, *Stranên Gelêrî,* Weşanên Medya, 1998.

78 Josef Kurdman, *Första mötet.* di: Det nya landet, Lindelöws, 1998. Josef Kurdman, *Böckerna.* di: Även skakningar. Skrivarkursen. Syndbybergs Folkhögskola 2000.

79 Ihsan Eken, *Jag är kurd och pizzabagare,* Värmländsk kultur, nr 5/1991.

80 Angorî gundên din ji nav Karacadagê zêdetir çep derketine. Ev gunda bi muhalîfbûn û bi beşdarbûna xwe ya polîtîk ve hatiye nasîn.

81 Angorî gundên din gundê Gordoglî zêdetir sosyal û zêde kesên xwendî ji nav derketine. Kesekî ji gundê Celeb, gundê Gordogliyê waha tarîf dike: *"Berî bîst-sî salan dema em ji şerma nikaribûn ji mala xwe derketana derva, Gordogliyan bi şahiyan rojbûyîna zarokên xwe pîroz dikirin!".*

82 Ji gotinên kesekî ji Anatoliya Navîn ku niha li Stockholmê şev-roj kar dike.

"Tu çir dikî, rind î?"

Amed Tîgrîs

Dema du kes li hev bipirsin û dengê "tu çir dikî, rind î" tê, mirov dizane ku Kurdên Anatoliyê ne. Dema ez li welat bûm, min dizanibû ku hejmareke mezin Kurd li Anatoliyê hene lê ez qet rastî wan nehatibûm. Piştî 1980î ku ez derketim Ewropa min Kurdên Anatoliyê ji nêzîk ve nas kir. Dema ez hatim û li Stockholm bi cîh bûn komela Çandiya Kurd li Stockhlmê hebû. Ev komele Ya hevalên DDKD bû. Hejmara endamên komela me 20-30 kesan derbas nedibûn û ji nîvî bêtir Kurdên ji herêma Konyayê bûn. Hemû jî ciwan û temenê wan di navbera 18-25 salan de bûn. Ji derî dusê kesên ku çend sal berî me hatibûn yên din hema hema em hemû di navbera çend mehan de hatibûn Swêdê. Em bi roj bi hev re diçûn dibistanê ji bo ku zimanê swêdî hîn bibin û piştî dibistanê jî dihatin komelê. Ji xwe ne îzna me ye rûniştin û xebatê hebûn û ne jî mala me. Çend kes di malekê de diman. Komele wek mala me bû. Em her roj danê êvarê piştî dibistanê dihatin komelê. Hevalên din jî li wir bûn. Komel geş dibû. Me di nav xwe de pere berhev dikir û li komelê bi dor xwarin çêdikir û dixwar. Hinek pereyê ku diman jî didan kaseya komelê. Piştre hevalên me yên ku ji ber zilma cutaya 12ê Îlonê derbasî Suriyê bûnûn kom bi kom hatin Stockholmê û komele bû wek kewara mêşan tijî bû.

Min hinek hevalên ku hatibûn ji zaroktî û bi malbatî nas dikir. Heta hinek jin ji dûr ve mirovên (eqrebê) min dihatin. Min hinek ji wan jî li Amedê nas dikir. Lê yên ji Konyayê li Swêdê li komelê nas kir. Divê ez rastiyê bêjim hevlên min ên herî nêzîk û samîmî ew Kurdên Konyayê bûn. Her çiqas ne komele ma û ne jî sîyaseta ku em li dorê kombûbûn ma lê hevaltî û nêzîkbûna me bi gîştî nebe jî heta îro dom dike.

Du sal piştre musaeda min derket û min zarokên xwe anîn. Ji min re xanî li herêma Fittjayê derket. Dema ez çûm li xanê mêze bikim, çi bibînim baş hemû cîranên min Kurdên ji herêma Konyayê ne. Vê carê em bi malbatî bûn cîran. Ne cîranên ciwan û xwendkaran, cîranên kesên mezin, kal û pîr, hecî û xoce bûn. Di demeke kin de em jî bûn malbatek ji malbata gundên derdora Konyayê. Zarokên me li kreş û li der li cem hev bûn û bi hev re dilîstin. Lawê min ê mezin dest pê kir û bi devoka wan deng dikir. Wî rojekê gotineke şaş got û min jê re got "Evîndar ev kurdiya te ne rast e!" Bi hêrs li min vegerand û got "kurdiya te ne rast e, lê tu ji min re dibêjî."

Ez sê-çar sal cîranê Kurdên Anatoliyê mam, me hev baş nas kir. Bi rastî ji kurdayetiya wan re gotin û kusûr tune. 400-500 sal in ku ji Kurdistanê derketi-

www.arsivakurdi.org

Kurdistanê baştir diparêzin. Ez matmayî mam. Ne bi tenê kurdî, herweha rabûn û rûniştin, cilûberg, comertî û mêvanperwerî, alîkarî û hevgirtin û hevparastinê ve hatine hasîn. Bi dewlemendbûna edet û kultura xwe parastine. Ji Tirkan nezewicî ne û keçên xwe jî nedane Tirkan û niha jî ji derî çend îstîsnayiyan ev dom dike. Heta zû bi zû keç nadin Kurdên din û ji wan jî nayînin. Ji xwe parastina ziman, kultur û edetên xwe jî weha parastine. Niha jî taxa ku ew li wir dijîn wek taxa Kurdan e. Dema mirov di wir de derbas dibe, çi jin çi mêr hemû bi kurdî dipeyîvin. Zarokên wan di nav parkên taxê de dilîzîn û dengê kurdî tê mirov. Bi tenê jinên wan şalwar li xwe dikin ku ev ne yê Kurdan e. Taybetiyeke însanên Anatoliya Navîn e.

Em çûn şîn şahiyên hev. Şînên wan wek li gundên Kurdistanê ne. Şahî piçek hatiye guhartin. Di şahiyên wek sunet û dawetan de mesref û alîkariyeke pir mezin heye ku eqilê mirov nagire. Piraniya dîyariyan (hediye) pere ne. Hem jî pereyeke pir. Her malbat 10-20 hezar kron davêjin. Di dawetên wan ên mezin de nêzkî nîv mîlyonî kron kom dibe. Bi wan pereyan çiyê kar vedikin. Piraniya pîzeriya û lokanteyên Swêdê di destê wan de ne. Kurdên din jî wek rebenan bi guleke 30-40 kronî diçin dawet û şahiyên Kurdên Anatoliyê. Lê tişteke ne baş heye ku divê ez destnîşan bikim, ji ber ku zêde bi edet û kultura xwe ve girêdayîne, zarokên xwe pêşî didin mirovên xwe.

Ev nêzîkî 20 salan e ku ez mamostetiya kurdî dikim. Ji her perçeyên Kurdistanê û ji Kurdên Anatoliyên jî şagirtin min hene. Rastiyek heye ku beşek ji Kurdên Anatoliyê zarokên xwe dişênin kurdî û beşek jî tirkî an jî raste rast dişênin swêdî. Di vir de kêmasiyek heye. Lê rastiyeke din jî heye ku divê mirov bêje, ew kurdên ku ji gundên herêma Mêrdînê û Dîyarbekirê hatine, di navbera du-sê salan de êdî zarokên wan him di malê de û him jî li der kurdî deng nakin û bi swêdî deng dikin. Lê zarokên Kurdên Anatoliyê li Stockholmê ji dayik bûne dîsa bi kurdî dizanin û dipeyîvin. Ji kurdên Mêrdînê şagirtin min hene ku du sal berê hatibûn, ji ber ku swêdî nizanibûn min ji wan re alîkarî dikir, lê niha êdî ew bi min re bi kurdî napeyîvin, bersiva min bi swêdî didin. Ecêb e, ne!

Kurmanciya Kurdên Anatoliyê gelek xweş û kurmanciyeke kevn e. Di salên dawî de hinek gotinên tirkî têkil bûne û bi dawiya hinek lêkeran (eylema) ve "imiş" a tirkî pê ve dikin. Bi wan re gelek gotinên xas û taybetî jî hene. Rojekê min bi zanebûn ji şagirtekî xwe yê Anatoliyê bi swêdî pirsî:

– Wehbî mirov dema bi kurmancî li hev dipirse çi dibêje?

Bersiva wî amade bû:

– Tu çir dikî, rind î? dibên.

Min got:

– Rast e, ev jî kurmancî ye, lê bi zimanê nivîskî divê mirov bêje:

– Tu çawa yî, baş î?

Ji min pirsî:

– Te got çi? *Ka li texte yazmişke!*

Dema min li texte nivîsand, got:

– Na, ev ne bi kurmancî ye. *Em dibên tu çir dikî, rind î?* Ê te bi tirkî ye.

Min kir û ne kir, min nikaribû Wehbî îkna bikim ku ev ne bi tirkî ye. Keniya ji min re got:

– Eze êvarê herim malê û ji birangê xe Mistefa ra bêm: *"Tu çawa yî, baş î?"* wê hingê ewê bêje tu bi tirkî deng dikî he!

www.arsivakurdi.org

Li Beledîya Botkyrkayê rewşa zimanê kurdî


Zekî Bozarslan

Navê min Zekî Bozarslan e. Ez ji bakûrê Kurdistanê, ji bajarê Amedê me. Ez piştê darbeya 12ê îlonê a sala 1980î derketim derveyê welat. Demeke dirêj e ez li Swêd li bajarê Stockholmê wek penaberekî kurd dijîm. Li Swêd, ji bo jîyana rojane, ji bo meşandina karûbarên malbatî û ji bo bidestxistina karekî ku mirov bikaribe pê debara xwe bike, hînbûna zimanê swêdî pêwîst bû. Ji ber vê yekê jî ez demekê çûm dibistanê hînê swêdî bûm. Piştê hînbûna zimanê swêdî jî dozdeh sal in, ji sala 1990î û vê de, ez li beledîya Botkyrkayê wek mamosteyê zimanê zikmakî dixebitim.

Nifûsa rûniştvanên beledîyê heştê hezar e. Beledîye di nava sînorên wîlayeta Stockholmê de li başûrê bajêr dikeve. Bakûrê Botkyrkayê herêma bîyanîyan e. Ji hemû deverên dinyayê mirov li vê beledîyê hene. Di dibistanên beledîya Botkyrkayê de bi 48 zimanan dersên zimanê zikmakî tên dayîn. Di vê beledîyê de hejmara kurdan jî gelek zêde ye. Lê hejmara kurdên ji bakûra Kurdistanê pirr kêm e. Eger mirov kurdên soranîaxêf (zaravayê soranî) nehesibîne, sedî 95ê kurdên ku li vê beledîyê dijîn kurdên Anatolîya Navîn in. Dema min dest bi kar kir heşt şagirtên min tenê hebûn û em çar mamosteyên kurd bûn; em sê mamosteyên zaravayê kurmancî û yek jî ê zaravayê soranî bûn. Di vê demê de hemû zarokên kurd nedihatin dersên kurdî, ji ber vê yekê jî hejmara şagirtan kêm bû. Şemaya mamosteyan tije nedibû. Ji bo ku şemaya hin mamosteyan tije bibe, alîkarîya hin dersên din jî dikirin û bi vî awayî jî seatên xwe yên kêm tije dikirin. Di vê demê de li dibistanên beledîya Botkyrkayê rewşa zimanê kurdî ne baş bû.

Dibistanên beledîyê hemû di destê mamosteyên tirk de bûn. Di gelek dibistanan de, du-sê sinifên tirkî hebûn û ji sedî pêncî şagirtên wan jî zarokên kurd bûn. Di nava vê demê de, ji ber gelek sedeman, me sedî heftê, heştê zarokên kurdan, li hin cîyan sedî sed, ji destê mamosteyên tirk derxist. Di hemû dibistanan de hejmara şagirtên wan kêm bûn, polên wan hatin girtin, hejmara mamosteyên wan jî nîvî bû. Yek ji wan sedeman jî ev bû: mamosteyên kurd ku li beledîya Botkyrkayê dixebitîn, karekî pirr baş kirin. Niha pêncê şagirtên min hene. Mamosteyên din jî her yek çil, çil û pênc şagirtên wan hene. Salekê ye 30-40 zarokên kurd jî bê mamoste ne, divê mamosteyekî din jî bigirin kar. Em niha heft

www.arsivakurdi.org



mamoste ne, pênc ên zaravayê kurmancî û dido jî ên zaravayê soranî ne.

Pirsa ziman, çand û hevotina mirovan li hemû welatên dinyayê pirseke çînayetî ye; ew bi rewşa mirov a aborî ve girêdayî ne. Li hemû welatên dinyayê, kesên dewlemend, kesên xwenda, kesên baş hevotî her tim xwedîyê ziman û çandeke dewlemend in. Her çiqas li hin welatên Ewrûpayê, li welatên endustrî, ev navber hinekî kin bûye, lê dîsa jî di nava axaftina dîrektorekî, şefekî, mudurekî û di nava axaftina karkir an jî karmendekî de ferqên mezin hene. Pirsa hînbûna ziman, zimanê xwendin û nivîsê, di civatê de li ser daxwazî û mercên mirov ên aborî dimîne. Daxwaz û mercên mirov ên aborî hebin mirov dikare di hêla karûbarên ronakbîrî de, di hêla ziman û çandî de xwe bi pêş bixe.

Di hemû civatan de, ji gelek kesan re dawîya hînbûna ziman nayê. Di parvekirina karûbarên civakî de her beşekî kar û zanîngehan zimanekî wan ê taybetî heye. Wek nimûne: hekîmî/tib, hiqûq, felsefe, matematîk, fizîk, kîmya û hwd. Mirov dikare bêje: kesên baş hevotî bi sedî nodê zimanê xwe ê neteweyî dizanin. Lê hin kes jî hene, ew di nava pêvajoya hemû jîyana xwe de qîma xwe bi çar, pênc hezar bêjeyan/peyvan tînin. Pirsa hînbûna ziman pirsa pêvajoyê ye; hînbûna ziman ji yeksalîya mirov dest pê dike heta piştê zanîngehên bilind jî dom dike û ew tu caran jî li emrê mirov nanêre. Li gora lêkolînên ku li hin welatên Ewrûpayê û li Swêd hatine çêkirin, sebîyekî heft salî, dema dest bi dibistanê dike, ew di jîyana xwe ya rojane de neh hezar bêje bi kar tîne û salê jî hezar bêjeyên nû hîn dibe. Li Swêd zarok heft salî dest bi dibistanê dikin. Bêşîk mirov vê pêşketinê nikare di zarok û mirovên welatên paşdemayî de bibîne. Xezîneya bêjeyên ku zarokên kurd û ên bîyanîyan pê diaxifin pirr hindik e.

Wek ku tê zanîn, gelek pirsgirêkên welatên paşdemayî hene û bingehê hemû pirsgirêkan jî pirsa aborî ye. Li wan welatan gel bê kar e, feqîr û kêm hevotî ye. Bi gelemperî kesên ku ji welatên paşdemayî, ji ber pirsgirêkên aborî tên welatên Ewrûpayê, kesên feqîr û kêm hevotî ne. Li hemû welatên Ewrûpayê û li Swêd, li taxên karkir û karmendên nizim de rewşa dibistanan ne baş e. Li van taxan hejmara mamosteyan kêm e, mamosteyên baş tunin, an jî li van herêman kar nakin; pirtûkên dersê kevn in û îmkanên teknîkî jî hindik in. Di van dibistanan de ne tenê rewşa zarokên bîyanîyan ne baş e, rewşa zarokên swêdîyan jî xerab e. Li gora lêkolînên dawîn ku li Swêd hatin çêkirin û encamên wan çendekê berê di rojnameyan de hatin belakirin, li Swêd sedî 13 (% 13) zarokên ku pêngava navîn/ortaokûlê xilas dikin nikarin dîploma bigirin; ji ber vê yekê jî ew nikarin herin lîseyê.


Bêşik di hêla zarokên bîyanî de rewş pirr diha xerabtir e. Dîsa li gora lêkolînên zanistî, ev tespît him ji bo zarokan û him jî ji bo mezinan derbas dibe. Salbihurî û zarokên ku baş bi zi-

www.arsivakurd.org

manê dayîka xwe, bi zimanê bav û kalê xwe nizanibin, ew nikarin zimanekî bîyanî jî baş hîn bibin. Em li beledîya Botkyrkayê, di karûbarên xwe ên rojane de her roj dibin şahidê vê rastîyê. Çend roj berê (5/4-2002) min li xwarinxana dibistanê firavîn dixwar. Xortekî kurd ê şazdeh salî bi tevê hevalê xwe ve hatin li maseya min rûniştin; me bi hev re firavîn xwar.

Ew havînê pêngava navîn xilas dikin, derin lîseyê. Me pirsa hev kir. Heta me xwarina xwe xwar, me suhbet kir. Min pirsa dersên wî kir. Wî got, "dersên min baş in." Min got, "swêdîya te çawa ye?" Wi got, "baş e." Min ji wî pirsî, min got, "substantîv/e (navdêr) çi ye?" Wî tiştekî din ji min re got. Min jê re got, "li ser masê tije ne." Wî dîsa jê dernexis. Ji bo pirsa verb (lêker) û adjektîv/adjective (rendgdêr) jî bersêva wî wisa bû. Min ev navan ji neh, deh şagirtên din jî pirsî, wan jî nizanibûn maneyên van bêjeyan çi ne. Ev bûyer rewşa zarokên bîyanî li dibistanan pirr baş nîşan dide. Şagirtên ku pêngava navîn xilas bikin, divê ew bi navê hin termên rêzimanî/gramatîkî bizanibin. Çawa ku çar zaravayên zimanê kurdî hene (kurmancî, soranî, hewremanî/goranî, dinbilî) û her zaravayek jî devokên wî ên cihê hene, kurdîya kurdên Anatolîyê jî di zaravayê kurmancî de devokeke taybetî ye.


Çawa ku her devokek zaravayê kurmancî xwedîyê hin qaîde û bêjeyên tayîbetî bin, hin bêjeyên ku mexsûsê wê herêmê ne, her wiha devoka kurdên Anatolîyê jî xwedîyê hin deng û bêjeyên taybetî ye. Devoka ku kurdên Anatolîyê pê diaxifin û devoka herêma Meletyê û Adiyamanê nêzîkî hev in. Bêşik hemû kurdên Anatolîyê ji



Meletyê û Adiyamanê tenê neçûne; ew ji herêmên Kurdistanê ên cih çûne. Lê devoka Meletyê û Adiyamanê di nava kurdên Anatolîyê de serdest e. Ji ber ku demeke dirêj e kurdên Anatolîyê ji welat û gelê xwe dûr ketine, kurdîya wan mecala xwe nûkirin û dewlemendbûnê nedîtîye. Kurdên Anatolîyê gelek bêjeyên kurdî ji bîr kirine, ji dêlva wan bêjeyan de bêjeyên tirkî di axaftinên xwe ên rojane de bi kar tînin. Kurdên Anatolîyê, bi taybetî jî zarok navê gelek heywanan, navê rengan, navê mehan, navê demsalan, navê fêkî û zebzeyan, navê şîranîyan, navê mirovên malbatê ên wek: ap/mam, met, xaltî, pismam, dotmam, dapîr, bapîr..., navê hejmaran, navê gelek navdêr û rendgdêrên din ji bîr kirine.

Gelek kurdên Anatolîyê ku li Swêd dijîn, bi gelemperî mêr, ên ku têkilîyên wan bi kurdên Kurdistanê re hene, kurdîyeke pirr paqij hîn bûne. Ji ber ku mêr kar dikin, pirr wext nadin zarokan, bi zarokan re pirr hindik diaxifin, alîkarîya dersên wan nakin, tikilîya zarokan zêdetir bi dayîkên wan re hene; kurdîya zarokan jî kurdîya dayîkên wan e. Dema min nû dest bi kar kir, literatûra Kemal Sûnal di nava zarokên kurdên Anatolîyê de pirr zindî bû, lê ev çend sal in mirov êdî wê nabihîze.

www.arsivakurdi.org



Li Botkyrkayê bi gelemeperî rewşa zarokên bîyanî û bi taybetî jî rewşa zarokên kurdan li dibistanan ne baş e; gelek dersên wan zeîf in, swêdîya ku hîn dibin jî pirr qels e. Stockholmî ji swêdîya zarokên bîyanî re dibêjin, "swêdîya Rînkebyê (Rînkebîyê)." Rînkeby li bakûrê rojhilatê Stockholmê navê taxekê ye ku sedî 95ê rûnişt-vanên wê bîyanî ne. Swêdîya Rînkebyê tê maneya ku zarokên bîyanî di hêla: rêzimanî, hevoksazî/sintax û dengan de pirr xerab diaxifin.


Li hemû deverên Swêd û Botkyrkayê sedemê biserneketina zarokên kurdan û ên bîyanîyan ev e: zarok an jî xort zimanê xwe ê zikmakî baş nizanin; ew ne bi zimanê devkî û ne jî bi zimanê nivîskî baş dizanin. Ew li mal dersên xwe çênakin, ew heta direng temaşeya kanalên tirkî û ên din dikin; dê û bav alîkarîya zarokan nakin, ew zarokên xwe li benda dibistanan û Xwedê dihêlin. Di dibistanên Swêd de dîsîplîn tûne, şagirt guhdarîya mamosteyan nakin, xort ji bo paşeroja xwe berpirsîyarîyê nagirin. Li hemberê hemû kêmanî û zehmetîyan, dîsa jî gelek şagirtên kurd li Swêd û li Botkyrkayê bi ser dikevin; ew derin di zanîngehan de dixwînin. Tiştekî kurdên Anatolîyê ê pirr baş heye ku ew bi hev re kurdî diaxifin û edetên xwe jî pirr baş diparêzin. Kurdên soran ne tê de, mirov pirr kêm rastê kurdên Kurdistanê tê ku ew bi hev re kurdî diaxifin. Ji xwe ciwan bi hev re qet kurdî qise nakin. Ez her tim li beledîya Botkyrkayê, li kuçê, li çarşîyê, di tirênê de, di dibistanan de kurdî dibihîzim. Çawa ku mal, milk, pere, zêr, zîv û tiştên wiha ji mirov re dewlemendî û serfîrazî bin, bi zimanekî paqij û dewlemend axaftîn û xwedîyê çandeke dewlemend bûn jî wisa dewlemendîyek e ku bi destê her kesî nakeve! Mirov bi zimanekî dewlemend û rewan bikaribe biaxife ji wê xweştir tiştekî din tuneye. Lê ji bo ziman û çandeke dewlemend divê mirov di mala xwe de refek, du refan ji pirtûkan re jî veqetîne. Zimanê ku mirov pê diaxife neyenika çand û hevotina mirov e!

Ji çar şertên netewebûyînê ê herî girîng yek jî ziman e. Xalên ku mirov dikin netewe an jî neteweyan ji hev cihê dikin: ziman, erd, çand û şiklên mirovan ên fizîkî ne. Ziman ji bo hemû neteweyan faktorekî nasnameyê yê bingehîn e. Ji hemû neteweyan bêtir divê em li ziman û çanda xwe xwedî derkevin. Ji her kesî bêtir divê em bi zimanê bav û kalê xwe biaxifin! Ji ber vê yekê jî hînbûna ziman ji bo kurdan jî hewcedarîke pir mezin e. Ziman û çanda me îro ji her demê bêtir di talûkê de ne! Bi gotineke din, îro hebûna me ya neteweyî di talûkê de ye!

www.arsivakurd.org

Zarokên Bîrnebûnê

M. Hakki Balta



Dema hevoka dawî jî hûr bû,
Gotina dawî jî temirî,
Bêjeya dawî pişirî,
Kiteya dawî jî heliya
Zarok xeberdan û nivisîna
kurdî ji bîr kirin
Ew çax
Ew çax dê kurd bibêjin eywax!
Ew dê fêhm bikin ku,
Bê xwendin û nivisîn
Li ser koka xwe şexsîyet girtin ne mumkun e.


Îro du heval hatin dibistana ku ez tê de kar dikim. Hewa xweş bû, bi hatina wan hewaya sinifa min xweştir bû. Ev ne cara yekem bûn ku heval û dostên min dihatin serdana me. Lê armanca hatina van herdu hevalan balkêş û pir bi rûmet bû. Wan rewşa şagirtên kurdên ku ji Anatoliyê hatibûn meraq dikirin. Rewşa şagirtên kurdên ji Antoliyê! Hmmm! Ev cara yekem bu ku hin mirovên kurd rewşa van şagirtan meraq dikirin û dihatin dibistanên ku ev şagirt li wir dixwînin. Dibe ku hin mirovên din jî ji bo vê armancê çûbûne dibistanên din, li min neditiye.

Bi baweriya min ev gaveke nû û hêja ye. Zarokên BÎRNEBÛNAN jî êdî tên bîra hin zanyar, nivîskar û welatparêzên kurd. Rewş û aloziyên şagirtên Bîrnebûnan hêdî hêdî bala welatperwerên kurd dikşîne. Ji bo min ev gaveke pêşketî ye. Divê kurd piçek jî bala xwe bidin ser rewşa şagirtên kurd, bala xwe bidin ser rewşa şagirtên kurdên ku ji Antoliyê hatine.

Mêvanên min dixwestin şagirtan biwînin. Wan dixwestin bi şagirtan re xeber bidin. Wan dixwestin ku li tiştên ku şagirtan çêkirine binêrin. Wan dixwestin xebatê şagirtan bibînin ku bikaribin rewşa wan a îroyîn fêhm bikin. Mêvanên min ji kovara Bîrnebûnê dihatin. Di sinifa min de me hêja qehweya xwe venexwar bû. Mêvan derketin der. Li ber deriyê sinifa min şagirt top dilîstin. Mêvanan ji şagirtan re bi kurdî merheba got. Şagirtê min Firat zivirî ser mêvanan û jê pirsî:
-Ma hun kurd in ?
-Erê! em kurd in.
Firat zivirî ser hevalên xwe û got:
- Aaa ! Ev jî kurd in. Bi kurmancî deng dikin!
Esra, Gokhan û Seher bi ken:
-Haa welle ev jî kurd e.

www.arsivakurd.org

Şagirt li dora mêvanan kom bûn. Çavên wan diçirisîya. Ken û rûgeşiyek xweş li serûrûyên wan bela bû. Wek tê zanîn nivîsên li ser perwerdeyê û şagirtan bi teorî û perspektivan teng û hişk dimînin. Jîrekî û rewan nivîsîn jî nikarin ji pirsan re bersîvên baş peyda bikin. Divê lêkolînvan li cîhê problemê, dakevin nava jîyana ku dê li ser tiştan binivisîn. Li wan deran li bersîvan bigerin. Ev hevalên ku li naskirina şagirtên kurdên Antoliyê digeriyan, dixwestin problem, alozi û zehmetiyên wan, di warê perwerde û çanda kurdî de, rewşa wan bibînin, bibihîzin ku bikaribin li ser problema wan rawestin. Baweriya min ev metodekî gelek baş e. Dema ku; mamoste di vê dema dawin de (ji pazdeh salan vir de) gelo çi gûhartin di nava vî grûbê de çêbû ne? Gelo tu dikarî ji me re binivîsî? Hevalên Bîrnebûnê ji min pirsîn, bi dilxweşî min got. Ji bo hin xwendevanan tiştên ku li jêr niqte niqte ez dê rêz bikim, dibe ku kêm be û hin tişt jî şaş bin. Lê ev tiştên ku min roj bi roj ditîye û jîyame, tiştên ku min hîs kîriye ez dixwazim bînim holê. Ez dixwazim di zeminekî nerm de ev tişt di ber çavan de bêne derbas kirin.



Mamoste Hakki Balta (li milê çepê) di sinifeke kurdî de

DI NAVA PAZDEH SALÊN DAWÎ DE DI NAVA KURDÊN ANTOLIYÊ YÊN FITTJAYÊ DE ÇI GUHARTIN ÇÊBÛNE?

REWŞA WAN A DUH:
SAL: 1985

1. Di van salan de 2-3 şagirt dihatin dersên zimanê zikmakî (kurmancî).
2. Zarokên kurdên Antoliyê ji % 99 diçûn dersên zimanê tirkî. An ji di sinifên tirkî de dixwendin û bi tirkî perwerde dibûn.
3. Navê komeleyek kurd hebû lê di pratîkê de kurdên Antoliyê ne endam, ne jî diketin nava kar û barên wê.
4. Hinek ji endamên komela tirk, di van salan de kurd bûn. Ew di nava rêxistinên tirk de bûn.
5. Di her warî de xwedî çand û adetên kurdî bûn.
6. Di dibistanên Swêd de her sal bi beşdarbûna wan cejnên tirkan dihatin pîroz kirin.

www.arsivakurdi.org

7. Di malên xwe de wek kurdên Kurdistanê çand, adet û bi zimanê kurdî dijîyan.
8. Rewşa wan a xwendinê pir nizim bû. Piranîya jinan nizanibûn bixwînin û binivîsin.
9. Li mala xwe, bi hev re bi zimanê kurdî xeber didan. Lê bi yekê kurdê ji Kurdîstanê re tirkî xeber didan. Sebeb jî; digotin/dibêjin ku kurmanciya me kurmanciyek safî nîne. Ne wek ya wan e, em ji wan fahm nakin.
10. Bi piranî govend, çîrok, metelok û sitranên mintiqa xwe ên kurdî dizanibûn. Govendên Hekariyê, Suleymanîyê, Diyarbekirê nedîtibûn ne jî dizanibûn.
11. Ji wan gelekan nivisîn û xwendina kurdî nedîtibûn, ne jî pir bala wan dikişandin.
12. Li Swêd di warê fermî de wan xwe wek tirk didan nasîn û sîstema Swêd jî ew wek tirk dihesiband.
13. Her tiştên vê grubê yên baş wek 'perçeyek ji kultura tirk' di medyaya Swêd didan pêşkêş kirin.
14. Di hişê wan de statuya zimanê tirkî û swêdî ji ya zimanê kurdî bilintir bû .
15. Xwedî nasnameyek kurdî bûn, lê kurdayeti ya wan a ew demê di nava sînorên mintiqa wan de mabû.
16. Ji sazûman û rêxisrinên kurdî dûr bûn.
17. Têkilîyên wan û kurdên ku ji Kurdistanê hatibûn pir kêm bûn.
18. Haya wan ji kultura wan hebû, lê belê zêde nîn bû.
19. Welatnasîn pir qels bû. Welatperwerî di mejîyên wan da baş çê nebibû. Ji ber vê yekê jî wan nikaribû ji tevgara kurd re bibin alîkar. Mirov dikare van niqteyên jorîn kêm an jî zêde bike. Lê bi baweriya min rewşa grûba kurdên ku ji Antoliyê hatibûn Swêd, li mintiqa Fittyayê berî bîst salan ev bû.

REWŞA WAN A ÎRO:


SAL: 2002

1. Di Botkyrkayê de nêzî 400 şagirt diçin dersên zimanê kurdî. Ji % 90 ê wan zarokên kurdên Antoliyê ne. Hejmarek pir kêm zarokên kurd bi zora malbatan diçin dersên tirkî, wek zimanê zikmakî.
2. Îro di nava komeleya tirk de hîç kurd tu nin. Komela kurd, qehwexaneya kurd hene û kurd diçin van komele û qehweyên xwe.
3. Di cejnên tirkan de beşdar nabin. Di malên hemû kesan de qanalên televîzyonên kurd hene. Pirani li wan temaşe dikin.
4. Bi zimanê kurdî deng dikin, bi çanda û adetên kurdî dijîn.
5. Kurd û kurdiya Kurdistanê ji wan re'êdî xerîb nînin.
6. Wek mirovekî ji Kurdîstanê êdî dikarin, govendê Hekarîyê, Suleymanîyê, Dîyarbekirê û Serhedê bikşînin, stranên wan taxan guhdarî dikin. Ferqa dewetê wan û yê Dîyarbekirê nemaye.
7. Di civata Swêd de, di daîrên resmî de bê tirs, heta bi serbilindî xwe bi kurdayetiya xwe didin nasîn.
7. Lê hê jî statuya zimanê tirkî û swêdi li ba wan ji a kurdî bilintir re.

www.arsivakurdi.org

8. Ji sînorê mintiqa xwe derketine. Kurdiya wan bûye kurdîstanî. Têkilîyên wan û kurdên ji Kurdîstanê gelek germ bûye. Bi vê germahîyê, sinorên sunî yên navbera wan gav bi gav perçe bûne/dibin.
9. Li koka xwe digerin. Êdî ew dizanin ji ku û çima bav û kalên wan koçber bûne hatine nava Antoliyê.
10. Piraniya wan di nava sazûmanên kurd de ne, an jî xwe nêzî wan dibînin. Di her warî de bi wan re alîkariyê dikin.
11. Niha haya hemû malbatan ji dîrok, bûyer û xebatên kurdî heye.
12. Di cejnê kurdî de, di meş û xebatên kurdî yên cûda cûda de beşdar dibin.
13. Bi sedan xort û keçên wan di nava baskên tevgera kurd a milli de ci girtine, bi dehan şehît dane.
14. Pêşketin û gihaştina hîsên wan ên milli di warê başîyê de tesirek mezin li ser jîyana wan a aborî jî dike. Xwedî li hev derdikevin, ji bo pêşketina aborî bi hevre alikarî dikin. Lê ev tişt hê di nava wan de şitil e.
15. Nifşa nû a xort û keçan, zana û xwenda ne. Gelekê wan di universiteyan de dixwînin. Kurd in, şîyar û welatperwer in. Niha êdî bi sedan zarok, xort û mezin, dikarin bi kurdî bixwînin, binivîsin.

Em dikarin van babetan zêde an jî kêm bikin. Lê ne pêwîst e. Pêîşveçûna tevgera milli ya nava welat, tesîrekî mezin li kurdên dervayî welat ji kirîye/dike. Kurdên li Kurdîstanê kurdên 20 sal berê nînin, ne jî kurdên Antoliyê kurdên 20 sal berê ne. Guhartin bi xwe re problemên nû tînin. Çareserkirina wan, ji bo çareserkirina wan hewldan bi rûmet e. Lêgerîna ser probleman, nîv çareserkirina problema ne. Fîttajayê rengê xwe guhartiye. Wek bihar, kulîlikên nû ji nava civata kurdên Anadoliyê dipijkivin. Reng û reng in.Divê ev kulîlik mezin, gur û zana bibin. Welatnas, şîyar û fedekar in. Kovara *Birnebûn* û kurdên Anatolîyê hûn her bijîn! Hun tim hebin.



Çend sûretên Sertap Buldukê

www.kurdishkurdi.org

Mêrê Çê

M. Şîrîn Dağ

Ro bi nîvî, di paş çiya de çûbû xar. Li ber ga -golik, pez-berx, ker-hesp hen ji wana bi şivan hene jî bêxwedan diçêrin. Li ser şîva dengê vî terekî, kale-kala pez û berxan, mure-mura mange û golika tev û hev diwû. Husê jî, berê berxên xwe berve malan kir. Dixwast çêre bi çêre, hêdî hêdî wana biwe mal. Wî ji hevalê xwe re: "Heso tu jî giran giran berxên xwe berhev bike, em herin mal. Te şîva xwe jî xwar-nexwar zû were, em herin nava gund bigerin'.

Hes, hevalê wî yê cane can wû. Hus, çiqasî xag, çiqasî ji xwe xwaş wû. Her jî wiqasî sistî-pist, wiqasî jî pejmûrde wû. Lê, ew yekî pir ji xwe qayîl bû. Te digot qet emsalên wan li dinê tune ye.Wê salê, dibistana yekemîn xilas kiriwûn. Ne bi şore yê, êdî ew xortên 12-13 salî ne. Porê xwe dirêj kirine, perçem berdane, yek dilê xwe girtine. Di beriyan wan de şe û neynik hebûn. Dinê, di bin nigê wana de, eleg û bêjing wû.

Herdu xortên me tim li cem hevûdû wûn. Şev û roj dû hev nediman. Yekî, vê yekî nedikir. Ji bo ku apê Hesê yî şofêr bû, Hes li mala apê re radiket. Mala apê wî, cîranê bavanê Hûsê wûn. Herduyan jî nivînê xwe davîtin û li ser sapê ber mala apê Hesê, li derva radiketin. Bi ro li çolê; li ber berxwa, bi şev li nava gund herduyan tama dinê derdixistin. Bi rastî Hus kuda diçû, Hes jî di dû vî diçû û şora vî jî nedihate derê. A hun bizanin Hus hewan, Hes jî benê dû hewarê wû.

Germa nîvro wû. Li sîya malê, jîneke reş rûniştî wû. Li qederan mêz dikir. Çend jin, keçik û bûk li dor wê civiya wûn. Husê,çend pere kirine destê wê jinikê. Jê re got: "Qedera min jî mêz ke". Jinikê: "Xwedê du law û du keça bide te" got. Hus, bi wê gotinê pal-palî wû. Hesê jî, çengek ard da jinikê, wê, ji bo Hesê: "Tu kurikê te nabin". Hesê fiqare, di nav wan keç û bûkana de fedî kir, ji jinikê re got: "Lê, hiç bir kiz da mi olmeyecek?"

Cîranekî, ji jina bîhistî wû; jinika qedera jî Hesê re gotiye: "Ji te kurik nawin". Vî Hesê re got: "Here mal, daka te here ji tera, Gula Osê bixwaze. Mêrekî mîna te re derew kirin". Hesê şor nekirwûn dudu. çû mal. Ji daka xwe re: "Etê, here ji min re Gulê bixwaze". Hesê me jî, mêrê çê, bi lez çû mala Osê. Herdu destê xwe avîtin êşkên deriyê malê. Vî daka Gulê re, Gul nîşan da: "Vê bi mide" got. Daka Gulê, jineke bi aqil wû; kesekî bi vî henek kirine got: "Were qûrban. Ewê qole ye. Tu rûnê nanê xwe bixwe".

www.arsivekurdi.org

Hes bire ser sifrê. Hes zikê xwe ji zêd têr kir. Dû re rabû çû malê. Gul jî ji bîr kiribû.

Şeveke payizê ya çîksayî wû. Hîv li esmana tijî xwe dibiriqî. Esmanê tijî stêrk wûn. Xortê me yên ku hero bi şev diketin bostana işev dilê wana tirî xwast. Wê çaxê, diziya bax û bostanan ji şana xortaniyê wû. Li dawiya gund baxên tirî hewûn. Hes û Hus ketin rê çûne baxa. Çend guşî tirî wûnin. Nêzîkî baxa wûn, mixtarê gund û çend meriyên din bi erebeke hespa, ji zozanan (yaylê) dihatin. Mixtêr qeretiya wana dî, qîrînî bi ser wan xist, digot: "Lo, diza bigrin, lo diza bigrin". Hus û hesê, ji tirsa re berê xwe dane şûna xermanan direvin. Tu paş xwe nanêrin. Xortên berzewac in, nedixwastin werin nas kirin. Bi wê tirs û rewê dema ku gihiştin Korta Qeçel, kerekî li şûna xermana diçêrî, qeretiya Hes û Husê bi berçava ket kire zire zi berve wana mesşiya. Vê carê jî xortên me, berê xwe berve gund kirin.. Êdîn mixtar û hevalên vî ji bîr kiri wûn. Bi tirseke hîne mezin, ji tirsa kêr re bi lez direvîn gund. Husê, di karê xwe anî wû derê. Zanibû, şûna tirî bixwe, çi dê bê serê wana. Bi qîr û bar bange Hesê dikir. Digot: "Lo bireve, kerî ji kera di şevereşê de, me karên mê dizanê".

Hus û Hes li pêş, kerê nêr, di dû wana direviyan nav gund Hele hel wûn. Ziman devê herduyan de direj bûyî wû. Ketin nav gund, kêr di dû wana hê zire zir wû. Li ber mala xwe, Îbram raketi wû. Bi dengekî weng dikire xore-xor; te dê bigota, qet gakî hefsar li stû biçikîyê veditisê. Ji tirsa kêr re, Husê nivînê xwe Apê Îbram nediwûn û bi ez pêlê zikê apê na, mîna ku pêlê meşikek tijî nayî wû. Firiya hewa û pat li erdê ket. Apê Îbram ji xewê rabû û "Min di hestiyê bavê no, kî ye ew" gotî be jî, xprexor û bûrebûra vî, ker jî du wana veqetand.

Ker veqetiya be jî, xortên me wê şevê xiş xalî bûyî wûn. Xwe gîhandine ser şêp, herduya jî xwe avît ser nivîna. Lê, hal di yên me de nemayî wû. Pêçekê li ser nivîna vêsiyan. Mêze kirin kamyon li ber malê, çira apê Hesê vêdikeve, ji malê de jî îr û bara apê Hesê û jina vî tê. Hes got: "Huso, ew didin hev xingê dikpne". Mêr gotine: "Xing û şer navber bikin" got û bi lez çû xwe derî xist. Derî vekir, Hus di dû kete hundir. Lê wê demê jina apê; " Heso, tişt tûne. Min, vî apê te re got: "Te çima mît û reçel neanî ji kurika re" gotî be jî, Hes zeft neiribû. Rahişte orxama ser wana û çeng kir ku çi biwîne; herdu jî, yên başheval di nav nivînan de ne. Hesê got: "Pê apo ew çi ye?" got û bi derket. Li der, Husê: "Min zanî, bavê min, tim digot: "Mekevin navbera mêr û jina".

www.arsivakurdi.org

Bi hazaran Kurdên Anadoliya Navîn li festîvalê xwe da hatin ba hev

Festîvala Çanda Kurdên Anadoliya Navîn

NÊÇÎRVAN QILORÎ

Çardehê Nîsanê da li bajarê Holandê Rijswijkê bi tevlîbûna hazaran Kurd festîvaleke çandî ji bo Kurdên Anadoliya Navîn hat bi darxistin. Ev yekemîn car bû ku Kurdên herêmê li ser navê xwe festîvaleke wusa amade kirin. Di festîvalê da gelekî hozan û stranbêjên ku bi eslê xwe ev jî ji Anatolîya Navîn in, cîh girtin û bi stranan xwe ve coşa şahiye bilind kirin. Ji bil dengbêjan gelekî mevanen axaftvan jî tevî festîvalê bûn û helwesta xwe anîn zimên.

Li gorî komîteya amedekar nezîkî şeş hezar Kurd, ku zêdehiya van Kurdên herêmê bûn, beşdarî festîvalê bûn. Her çikas festîval li Holende da hatîbû bi darxistin jî, gelekî Kurd ji Swêd û Danmarkê bigre heta Belçîka û Elmanya elakadarî nîşan kirin û hatin pardarê şahîya cejnê bûn.

Hozan û stranbêjên ku heta dawiya festîvalê beşdarvanan coşî û xweşî dan festîvalê, ev bûn: Osman Yilmaz, Remazan Koca, Nurdîn Çiçek, Apê Reşîd, Cejno, Koma Çarnewa, Koma Bîrnebûn a Folklorê û Bilal Ercan.

Festîvalê da gelêkî axaftin jî hatin kirin. Mevanên ku ji Tirkiye ra hatibun, ku nav wan da serokê HADEPê ya bajarê Konyê Mehmed Bozdax û Serekê Giştiyê HADEPê Murad Bozlak jî hebun, axîfîn û kêfxwêÎşiya xwe anîn zimên. Endamê KNK Hanefî Celeplî û endama Partî Sosyalîsta Holandê Krîsta van Velzen û serokê FED-KOMê Egîd Helbset jî di festîvalê da axaftin çekirin. Egîd Helbest axaftina xwe da wusa



Dîmenekji festîfalê
(Foto: N.Qilorî).


www.arsivakurdi.org

got: "Em Kurdên Anadoliya Navîn îspatên vê yekê ne ku em bi inkarê ve nehatine tune kirin... Û ez hêvî dikim ku festîvalên hanê pêşerojê de jî verin darxistin"

Serokê Gişti yê HADEPê birêz Murat Bozlak di axaftina xwe da got ku ev gelekî dilxweş bûye ku ev tevî vê festîvalê bûye û komîteya amedakarî ra sipasiya xwe nîşan kir. Bozlak, wusa axifî: "Di Newrozê da bi milyona Kurd derketin meydanan. Li Diyarbekrê 700 hezar Kurd, çi mêr çi jin bin û çi keç û çi zarok bin meydana cejnê da kombûn. Gelê Kurd ew roj ve derê da, bin şiliyê da tabloya aşitiyê û biratî pêk anîn. Ew mîlyonan Kurdên ku Newrozê da derketîbûn meydanan daxwazîyên xwe yên aşitî, li ser rakirina cezayê îdamê û ji bo perverdeya zimanê zikmakî qirîn. Em jî wek HADEP xwe takîpvanê vîcdanê ya van daxwazîyan dihesibînin."

Gelek kesan ku xastîbûn tevî festîvalê bin lê nikaribûn, bi rêya mesajê ve lêborîna xwe xastin û pîrozbahîya xwe nîşandan. Di naw van kes û saziyan da Serbulent Kanat, Hecî Erdoxan, Herekata Îslamiya Kurdîstanê (HÎK) û KON-KURD jî hebûn.

Dîmenên herî bi hîs dawiya festîvalê da hatin şopandin. Hemî dengbêj û axaftvanên ku di festîvalê da cîh girtî bûn û komîteya amedekar derketin ser sehnê û dest dan hevûdu û bi hevra strana "Bertî, Bertî" gotin. Bi vê stranê ve festîval hat girtin û heta festîvalêke din însanan ji hev xatir xastin û belav bûn.



Kovareka nû

Di meha Nîsanê de kovareka bi navê *Veger* ji aliyê kurdên Anatoliya Navîn ve derket. Kovar li *Festivala Kurdên Anatoliya Navîn* li Hollandê hatibû belav kirin.

Veger bi zimanê kurdî û tirkî li Almanyayê derdikeve.

Em xêrhatina kovara Vegerê dikin û serkeftina wê dixwazin.

Redeksiyona Bîrnebûnê

www.wakurd.org

Sêviyên Rojava

Hasan Akbal

Li Anatoliya Navîn, li gundekî kurdan sê xortên emsalê hevdu bûn. Xwarin û vexwarina wan ji hev ne cuda bû. Her tim li ba hev û bi hev re bûn. Zarokatiya wan bi hevre derbas bibû. Her sê jî li koçeriyê di rê de li welatên biyanî hatibûn dinê. Li vê dinya ku ji Kurdan re bûye cehenem çavê xwe vekiri bûn. Gir bûn, mezin bûn û xortên hêja bûn. Her kar êdî ji destên wan dihat. Şivantî, gavantî dikirin. Carina ji xelkê re rençberî dikirin. Xerclixa xwe wiha dertêxistin û kî ji wan bêpere dima wî alîkariya yê din dikir. Perên xwe li hev parva dikirin.

Hemû xortên gund û emsalên wan ji ber mafqa wan her sê hevalan ve, ji wan diqehirîn. Lê belê, roj bi roj aboriya hemî gundiyan, ya wan û ya malbata wan berbi xerabûne diçû. Li ser milê dê û bavên xwe bibûn barekî giran. Bi vê nema wê salê kitlixiye (xelê) jî xwe da ser, feqirî, belangazî, nexwaşî, derd û keder hemî gehiştin ser hev. Herroj dergûşek, merivek dimir, heroj li ber malekê şînek dibû. Edî wa jiyana kambax nedihate kişandin. Uso bi Alo va dixwastin ku bi derna de birevin, herin, lê tu rê nedîtin. Uso rojekê hat got; Hevalno, pêşneyaziyeke min heye hêle ka hûn çi dibêjin ji bo vê pêşneyaziya min. Ez dibêjim herkes diçe derekê jo bo xebata li bajarên mezin. Werin em jî herin, qet em ne kûr in û seqet in? Tu derên me ên kêm û kêmber jî tun in. Em ne seqet in jî welleh em bibêjin em ê di rê de rezil û rûsva bibin. Bi Xwedê ve, ku hûn bi gura min bikin em jî herin. Hûn bên ere hertişt li ser milê min, ez soz didim we, ez tu kêmaye nexinim we. Mamo got; Ma te wa ya pêşneyaziya xwe ji ku derxist lo!-Min ji paşila xwe derxist. Ez duh êvarî li oda mala Haco yê Reşê bûm li wir qal dikirin. Heyanî sibê xewa min nehat, ev got;ina pir li kêfa min çû û di serê min de cih girt. Ji ber ve ji tiştekî wiha min di ber xwe re dibir û tîna, lê min ji we re nedigot. Ma ne wiha ye Alo? Min carekê ji te re got; ez bawer im". Alo got; Rast e te carekê ji min re got;. Lê belê min qet helnanî ciddiyê jî.

Min zanî ku tu duh êvarê xuya nebûyî Memo got; Min ji Alo re got; Uso îro xûya nebû, xêr e şer e! ez bawer im

www.arsivakurdi.org

ew di kortna helşiye, lê nizanim kî di kîjan kortê de ye? Alo got; na na lo Uso êke ye (berbizeqe) ka li kîjan civatê rûniştiye, kal kal dipeyîvê. Ma tu Uso nasnakî malneketo hevalê me yî çend sala ye. Uso bi wê gotina Alo keniya. Alo got; de bêje bêje ka te çi bihist, çi nebihs, ê ku te xwarî û vexwarî ma ya te be. Ye ku te bihsîtî ji me re bibêje. Ma we careke bidiya hevalno hemiyan, digotin walleh yekî nas hebe em jî zaroyên xwe pê re bişînin. Lê imkanên derfet me tunen, giştika li çavê min dinêrîn. Hemiya dizanî bû ku ez ê kêrî wî karî bêm.

Ez jî dibêjim werin em jî herin? Ma hûn çi dibêjîn hevalno! Memo got; welleh baş e, baş e, lê kesekî ji me bi Tirki dizanê tun e. Uso got; ez hindik dizanim. Ez ê we jî û xwe jî idare bikim. Belkî li rê yekî nas jî rastî me bê kî dizanê. Memo kire kem û kûm û got; na lo tu cara em ji gund derneketin, xeribî tiştekî dijwar e, rê nizanin, ziman nizanin, mîna sê axraza herin ku? Em ê di rê de perîş an û şelpezê bibin, ya din jî ez zewicî me. Zeynê bi ser kê da cih binîme, însanê niha ewle pê nabe, serê xwe kire ber xwe, di bin guha re sor bû. Uso got;, Memo tu cîlê sor bûyî lo!. Deng ji Memo derneket milê xwe kuta bersiv neda. Alo got; ji bo min ferq nake welleh, ez bi dergîstim, eger dergîsta min ez pa me, ya bi pê û eger ku ez nepame xwedê teva îş e wê bê birî avit mîna mêrekî çê.

Ez ê bi Uso re herim ceheneme jî. Ji bo Uso qet tu tişt ferq nedikir bêkar bû, li ku êvar li vir sibê. Herdûya bi birranî biryara xwe dan hema di ci da. Memo ji got; ez ê di hundire heftekî û deh rojan da biryara xwe ya çûyine bidim. Hûn bi serê xwe ne , lê belê ez ne bi serê xwe me. Evar bû Memo hat mal, jina wî Zeynê dît ku ew ne bi kêf e. Memo çi ye îro tu bêkêf xuya dibî. derdne te hene? Ne lê, qet tu tişt tune ye, bi te wiha tê xûya kirine. Zeynê Sifrê dayna li ser sifrê rûniştin xwarin di qirka Memo re nediçû xwarê. Zeynê ji rewşa Memo hez nekir. Dîsa di bin çavan re lê nêrî. Memo tişteki te yî heye îro tu ji min vedişerî yan jî cesaret nakî bi min re bibêjî.-Belê, Zeynê te baş zanî dewara me nabe jiyan dijwar bûye, divê ku ez herim bixebitim, li gund tu kar nemane ku wiha çû devara me nabe em îsal zivistanê li xwe zar û zor dertêxinî. Sal jî nebaş e, bimbareka baran û rehmet jî nabarine ku zevi çê bibin. Çê bibin çi ku jê bişeyitê.

Du cenderme bi penç pera ye bên wê ji dest me digrine diçin. Efendim wa oşûrê, wa heqê mixterê, wa heqê mala ye, wa çi zikime wa mîtike wa tawêji dest me digrine û tu xêrê bi me nake Roma Reş. Ma tu nizanî îsal hatin bi nav gund ketin kê çi xwe heye ew ji dest girtin, ye ku tu tişt nedayî lêxistin birin qereqol xiş û xalî kirin. Em çi awa bikin, nizanim, şaş im Zeynê. Ez dibêjim li wan gundên cîrana herkes diçe der ku bixebite, dibêjim ez ji herim çawa bikim li çavê Zeynê meze kir, melûl melûl mîna ku li ber bigere. Xwazî di qirka Zeynê de ma; bi kê ra herî tot murûzê xwe dalkir û awirên xwe tûj kirin. Hetana kî çûye tu herî. Izmirlî hersal diçe, ez jî herim.- Baş e, lê Izmirlî hercare bi xwe re yeke tîne, her halde tu jî wiha biki. Memo kenî Uso û Alo wan jî dibêjin em ê herin

www.arsivakurdi.org

eger ku tu jî bi me re herî. Tu ê min çi awa bi tenê cih binî li wî gundî ku ez tu kesî nas nakim.

Ez *egsigek* im bi tenê nawerim razem.-Em çi awa bikin em mecbûr in delala min. Ew gunda giştik çi awa bûne tu jî wiha bibi, qe tu ne li serê çiya yî.- Ez bi tenê nawerim ku razêm, welleh dost hene dijmin hene tu din bûyî lavo min bi tenê di navberê çar diwara de cih binî. Keçika mala Qasima bê nik te razê. Nizanim ku razî bibin nebin, ji bo Berivanê. Erê le malneketê! çi heye em giştik xisim û eqrabaye hev in. De cibîne lo, yanê kal û pîrê me giştik ji nezda mirin li wî gundî, ku em ji nezda bimirîn? Nemirin jî lê tu xer ji tê de neman zewaliye min. şev epêy çûbû Memo rabû çû derva ku avêka bi çuk birîjîne. Li gund mêze kir xeynî wan hemî gundî rakati bûn. Zeynê nivîn daynan û bi Memo va ketin nava nivînên xwe û herdu yan jî xew nekete çava.

Dora dina rojê Mamo çû mala Qasim. Selam in aleykûm cîran, Ma hûn mêvanan qebul nakin?- Li ser serî û li ser çava cîran, fermo derbasa hundir bê. Yek ji vir yek ji wir da peyivîn çay û qahvê vexwarin. Memo got; apê Qasim daxwaziyeka min ji te heye. Bibêje daxwaza xwe cîran, ku ez ji te re bibim derman. Ez dixwazim herim bixebitim, lê problemeki me heye, Zeyn bi tenê nawere ku razê. Ez ji te tika dikim ku bila Berivan bê cem Zeynê razê.Ew çi gotina te cîran, ezê bi qurbana te kim em cîranê hev in. Memo bi vê got;inê kêfxwaş bû. Spas cîran, ez di bin wê rindiya te da namînim bi'îzne Xwedê. Hate mal ku Zeyn hetanî dev hatiye awirên xwe tûj kirîne, eger ku mêşek li ser çavên wê daniya dê çil parçe bibe. Memo fam kir ku Zeynê qehiriye. Navberê bistek kete. Bi giran got;, Zeynê, tu zanî Berivanê bê cem te raze min bi Qasim re xeber da, got; ezê bi qurbana te kim.

Walle malê bavê min bişewite, ez te bernadim, tu ê herî û wenagerî, dilê min wiha dibêje. Mal xerabê devê te çi awa li wan got;inê wiha digerê, tu başek ji başê canê minî, tu rihê minî, hezkirina min ji çiya mezintir e, ji deşta Heranê û jî beriya Merdinê firehtir e û hezkirna xwe anî zimên.-Hiiim hiim tu wiha bibêje ha! ez qet bawer nakim. Na na welleh mezinê me digotin çi? Ma tu nizanî. Xeribî him dijwar e him jî xweş e, gava ku meriv hînî xerîbiyê bû destê xwe ji xeribiye nabe. Tu herî di jiyaneke din a nû kevi, dê me ji bîr bikî, hert tiştekî bî rbike! Mezinê me qal dikirin li kîjan gundî niha navê wî gundî neye bîra min, lavê kê çûye cihekî din ku bixebite wenegeriye, bûye berdoş û serxoş.

Paşe gundiya jî jin û zaroyên wî re pars kirine û paşê jî jinik belengaz wî mecbur maye, çûye mêrekî xwe din kiriye. Zarokên xwe birine bi ser mala xezûrê xwe kirine û zaroyên wê mîna cevrika di dûê diya xwe dikirne kuze kuz digrîne, dilê hemî gundiyan pê dişevtiye. Ev mêrê ku kir xizana min niha mêrekî tozkeke mîna însanan bûya. Bi şeş zaroyên xwe hebûne û çûye ser heviyê. Derdê sêviya, derdê heviyê ez naxwazim di rewşeka wiha kevim, derdê xelke bikşînim. Welleh ez te bernadim, tu ji li min wiha biki

www.arsivakurdi.org

got;.-E de baş e eger tu riza nekî ez jî narim qet ne tiştekî dijwar e Zeynê.

Ew roja wiha li ber gerîne derbas kir Memo. Ji aliyekî va Zeynê jî dixwast ku bila Memo here ji vê xizaniyê xelas bibibin. Lê bi Memo ew hêla xwe nedida xûya kirine. Memo çû cem hevalên xwe got;, welleh Zeynê îcaze nade ku ez herim, dibêje eger tu herî ez ê ji te cih bibim. Welleh hevalno tu niyeta mina ku ez jina xwe cih binim tune.-Belê rast raste em dizanin tu ji Zeynê ditirsî û newêrî, tu Eloyê Newêrek î, henekên xwe bi Memo kirin.-Alo xwe di ber re awit got;, na lo tu çiqasî sist î, bi gura jina dikî ha! bavê min ji me re digot; hûn bin û hûn bin bi gura jinên xwe nekin, merivê ku bi gura jina kirî, yan jî bi rêça wanda çûyî li civatên şûn warê xwe tune ne. Hînge kumê xwe ji serê xwe bike bideserê jina xwe.-Ma te du şelmaq biavitana bine guh ka hînge çi ava digot; here Uso got;.-Ji bo çi lebidim? got.

Tiştne pîs kiriye ku ez lê bidim, serê min berjer kiriye! Jin got;ine ku li ba mêrê xwe deng nekin, jin kolê mêrane, ma tu ne Kurdî lo? Erê ez Kurd im, lê belê hemî Kurd jî wiha nakin heval. Lewra bavê te li diya te wiha dike heryek diya te dipeyive bavê te wê ledide. Welleh diya min li ba bavê min newêre ku devê xwe jî veke. Jin jî însan in heval, pêvist e ku meriv wan jî guhdar bike. Merivê bihiş û aqil divê ku jina xwe guhdar bike û dilê wê jî bistîne, muhakak nêrînên wê jî hene, ez wiha difikirîm û wiha dibêjim. Ew got;ine ku tu dibêjî heval sed salî di ber ve digotin.

Ma tu nizanî însanî êdî diçe hîvê. Bi wî bavê xwe re bibêje hişê xwe bi serê xwe de, tozkeke mîna mêrîva bibe. Herdu heval jî bi vê got;ina Memo keniyan. Uso bi Alo wa got; Welleh ku em zevicin em bi gura jinên xwe nakin, jin kî ne û bi çend perane ajotin ser Memo û bi Memo qerf kirin. Memo qet dengê xwe nekir. Memo got; hûn sibê zevicin ezê we jî bibînim kume serê we yî ferê ye niha. Uso got; baş e em ê hatanî heftek biryara xwe bidin ji bo çûyîne, temam e hevalno? Ma Memo jî dilê Zeynê bike. Alo jî ma here ba dergista xwe bibîne xatirê xwe jê bixwaze. Alo malneketo qe tu jî mîna Memo nebêje welleh Dilber razî nabe ji bo çûyinê. Henekên xwe bi Alo kirin û kevir li Memo xist.

Memo jî di hundirê heftekî de dilê Zeynê kir û ewle da wê. Zeynê çû quran anî danî ber Memo, ez bi te bawer nakim, tu yê destê xwe li Quranê xînî ji bo ku wegerî mal û tu çaw reşiyê li min nekî. Memo destê xwe li Quranê xist. Te xwastiye ku ez bi Zend Avesta sond xim got. Zeynê yektên sekinî got; Memo Zend Avesta çi ye? Zeyna delal Zend Avesta, Qûrana Kurda ya berê ye. De iş lo! ji te jî çinê têne derê. Memo got; welleh kitaba Kurdan mûqadesa berê Zend Avesta bû, ma tu nizanî? Na welleh. Zeynê ew meselaka dûrnû dirêj e, ez ê rojekê ji te re qala wê bikim. Lê mêjoye Zeynê sekinî ji bo Zend Avesta yê. Alo jî hat bi dê û bavê xwe re şêwirî ji bo vê pêşniyaziya ku Uso gotê ku herin bajarekî biyanî bixebitin.

Bavê Alo bi va xebera lavê xwe pirr kêf xweş bû. Herê lavê min Xwedê

teva karê te be, qet tu kevir neynê ber lingê te, kevirek bê ber lingê te ma ber lingê me. Mûye Pêxembera di jinû ye tekevê, rê ya te rêya xerê bê, here lavê min ma em destê xwe li ber ker û kûçikan venekin. Bavê Alo gazî jina xwe kir. Lêêê hele bê, hele bê ku ez mizgînîke xêrê bidim te. Edûl ma te nebihst şêrê min Alo ku here bixebite êdî geçima (qaxuya) malê ketiye stûye wî jî, malê xwedê hezar carî awa be, ez girîk vê rojê jî bibinim ha! Keda me vala dernexist lavê me. Edûl got; tu ji ber vê mizginiyê wa bi xêr hatî. Heza xwe kir rabû ser piya çû lavê xwe maç kir û got; diya te bi qurbana te be Alo ye minî çav belek.-Lavê xwe kişande qûncekî got; lavê min tu î herî riyeka ka dûr û dirêj, here xatirê xwe ji Dilberê û xwasiya xwe jî bixwaze. Ma dilê wan li te nemine. Mezinê me digot;in heqî çar dê û bava yek e, lavê min. Alo rabû çû mala cîranê xwe ku ji Aram re bibêje here mala xasiya min bi dizîka bibêje Alo dibêje ez nezikî herime qurbetiyê bixebitime, ez dixwazim bêm Dilberê bibînim şevek li mala wan razem, xatirê xwe ji Dilberê û xasiya xwe bixwazim, ji wan re bibêje. Aman Aram ha bi dizîka bibêje, eger Rûstem beg heye qet dengê xwe neke, Rûstem merivekî pir esebi ye.

Aram rabû çû mala Rûstem begê bi dizîka bi Fatimê re got;. Te got; çi, min fahm nekir xwazî di qirke de ma. Alo ez şandim xaltiyê, dibêje ezî ku herime bixebitime, dixwaze bê te bibîne û xatire xwe ji we bixwaze. Xasiya Alo got; lavê min bavê Dilberê li malê ye, ez çi awa mûsade bikim, welleh ku Rûstem bibîze yê min jî Dilberê jî bi darda bike. Ji xwe Alo jî got;, bi dizîkî ve ji wan re bibêje, eger Rûstem li malê qet dengê xwe neke. Eger ku ji te pirsîn got;in tu hatî vira çi? Tu ye bibêjî dilê min xwast ez hatim vir, yan jî bê ez î li kûlekên me digerime. Dereweke xwe bike lo qet derew ne ku teva bûne. Ez bawer im ew dê hatanî du, sê rojan here bajêr, gava ku çû ez ê xeber bidim Alo Fatimê got;. Kînge diçe Alo? Welleh ez nizanim xaltiye, kîngê diçe, hat mala me ji min re got;. Min jî hat ji te re got.

Dilber hat nik diya xwe.-Ji diya xwe pirsî dayê Aram hatiye çi?-Aram hatiye dibêje got;in ji dev Fatimê derneket, di devê xwe de bir û anî û devê xwe lê negerî ku bi keça xwe re bibêje. Lavê Edûlê here bixebite li qurbetiyê û dixwaze bê mala me. Dilberê qet deng nekir, bengiz bet lê bû xizîk. Aram wegeri hati nik Alo. Ku xasiya Alo bi wî re got;iye û bi Alo re yek û yek got;.-Spas Aram. Uso jî bi dê û bavê xwe şêvirî, tu problem derneketin. Evar bû Memo zû wegeriya mal, Zeynê jê re xwarineke baş çêkiri bû wê rojê. Ji bo ku ew êdî mêvan bû û rê li ber wî wiha dihate xûya kirine.-Zeynê ez herime, xwe xemgin neke, li xwe baş mêzeke. Helê tu dest ji wan berde, li xwe jî mêze ke tu nekeve xemgîniya min. Tu wê rojê ji min re qala Zend û Avest kiribû, min got; tu bi Xwedê kî helê careke ji min re qalê bike. Min pir meraq kir ji aqilê min qet derneket. Baş e got; ez ê piştî xwarine ji te re qalê wê meselê bikim delala ber dilî min e.

www.arsivakurd.org

KOMELEKE NÛ

Xwendekarên kurd ku li belediya Botkyrka dimînin, di nav xwe de komelek saz kirin û navê wê danîn: Komela Kurd ya Lisê li Botkyrka (Kurdiska Gymnasieföreningen i Botkyrka). Çawa tê zanîn li vê belediyê bi hezaran Kurdên Anatoliya Navîn dijîn, wek "paytextê" wan tê hesibîn. Ji ber vê minasebetê, komelê bi sê zimanan daxuyanîk belav kir (swêdî, kurdî, tirkî).

Komela Kurd ya Lisê li Botkyrkayê

Me bi navê *Komela Kurd ya Lisê* rêxistinek saz kiriye (8ê adarê 2002). Mebest û armanca me bi kurtahî xalên jêrî in:

- Lihevnêzîkkirin û xûrtkirina pêwendiyên navbera xwendekarên kurd yên li lîseyên Belediya Botkyrka, Tumba, Tullinge, Botvids.
- Peydakirin û belavkirina meraq û heweseke xwendekarî di nav xwendekaran de, li ber dilên wan şêrînkirina xwendinê.
- Li ser dijwariyên civakî û kulturî yên xortên liseyê rawestin û çareserkirin.
- Têkuzkirina yekiti û tevgirêdana xortên kurd yên liseyê.
- Bi wezîfa pirekê rabûn, pira navera zaningeh û dibistana bingehîn. Ji alîkî ve wê arîkariya şagirtên högstadiyê bikin wekî arikariya derstan (läxhjälp) û ji aliyê din jî wê ji xwendekarên kurd yên unîversitê arikarî bixwazin.

Em anuha li belediya Botkyrkayê li lokalekê digerin, bona ku em bikaribin kar û xebatên xwe pêk bînin. Dê û bav an xwendekarên ku dixwazin pêwendiyê bi me re daynin, dikarin bi rêya e-maila jêrîn xwe bigihînin me: **kurdiskagymnasieforeningen@hotmail.com**

www.arsivakurdi.org

Alikariya Cenazeyan ya Anatoliyê li Fittja

(Anatoliens begravnings stöd i Fittja)

Di sala 1993'an de li Swêdê fondek ji aliyê kurdên Anatoliya Navîn de bi navê *Alîkariya Cenazeyan ya Anatoliyê li Swêdê* (Anatoliens begravnings stöd i Fittja) hatiye saz kirin. Çawa tê zanîn li vê taxa bajarê Stockholmê bi hezaran kurd dijîn û her sal hin kesên salbihurî, kal û pîr diçin rehmetê.

Veşartina cenazeyên wan hertim ne hêsa ye. Gelek malbatên kurd dixwazin cenazeyên nas û pizmamên xwe bişînin welêt.

Ev fonda, alikariya maddî û manevî ya van malbatên kurd dike. Fond tu rêxistinekê ve girêdayî nîne.

Her kesê 18 salî tijî kiribe, dikare bibe endamê wê.

Kesên ku dixwazên têkiliyê bi fondê re daynin, dikarin ji **Yakup Baysal** re telefon bikin.
Tel: **070/4002820**

www.kurdi.org

AGAHDARÎ:

Çawa me di hejmara berê de jî dabû dîyar kirin, li Stockholmê bi navê *Komela Çanda Kurd ya Gordogli li Swêdê* saziyek hatiye avakirin. Ji ber minasebeta sazbûna komelê, îsal di meha Gulanê de komelê biryar girtiye ku şahîkê çê bike. Li jêr cîh û dema şahiyê hatiye nivîsîn. Hun bi xêr bin:

Komela Çanda Kurd ya Gordogli li Swêdê

Cîh: Slagsta Strand
Dem: 25 Gulan / 2002
Seet: 11^{00}

www.arsivakurdi.org

KURDISKA Kultur dagar 3-4 maj

...och andra aktiviteter med kurder från Anatolien



3/5 Språkseminarier

• Språk • Identitet

Fittjaskolans aula kl 13⁰⁰–17⁰⁰

4/5 Barnaktiviteter

Fittja Gård kl 14⁰⁰–17⁰⁰

VUXEN

FEST lördag 18⁰⁰–24⁰⁰

Fittjaskolan • Entré 40:-

Kurdisk mat & musik


Kvällens artister:

Ceîno / Apê Raşit & Sami Küçükkara

Mer info: 530 625 68

Arr: Bildningsförbundet i samarbete med ABF-Botkyrka, Fittjaängskolan, Tallidskolan, Kurdiska Gymnasieföreningen, Fittja Ungdomsförening, Mångkulturellt centrum, Södertörns Högskola

www.arsivkurdi.org



Målning av Bekir Darı

www.arsivakurdi.org